


ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



31
1991

NAVEROK	
Nameyên xwendevanan	3
Şerê petrolê, Dinya û Trajediya gelê Kurd	4
"Serbestiya" Zîmanê Kurdi û Newrozê	
DILSOZ.....	6
Welatparêz û nivîskarê Kurd Seidê İbo hat kuştin	7
Biranînek -BARAN	8
Mamosta HEJAR	12
Deklerasyona Konferansa Stockholmê	14
Beyanama Yekitiya Nivîskar û Hunermendên Kurd	15
Bı Eskerê BOYİK ra Hevpeyvîn	16
Şairê "Zembilfiroş" û "Mewlûd"-ê: Melayê BATÊ	20
MEMO- Husên HEBEŞ	22
Helbest: Gul bû ala mîn, F. AHMED	24
J1 zargotina me: Lihevanin- Azad DILDAR û	
Bavê ZINAR	26
Berevoka Terman: Navê kêzik û parazîtan	28
NEWROZ 1991	29
Quncikê Zarokan: Meymûn, L.TOLSTOY	30

Sal: 12

Hejmar: 74, Nisan 1991

ISSN 0283-5355

XWEDÎ: KOMKAR-Swêd

BERPIRSIYAR: Şêroyê BOTAN

NAVNIŞAN: Gustavslundsv.168,1 tr
161 36 STOCKHOLM

TELEFON : 08/ 26 23 75

HESAP NO: PG. 458980 - 0

UTGIVARE: Svensk Kurdiska
Arbetsföreningen

ANSVARIG UTGIVARE: Ş. BOTAN

ADRESS: Gustavslundv. 168, 1 tr.
161 36 BROMMA

FAX: 08/ 25 38 57

Nameyên Xwendevanan

Y. Sovyet/Qazaxistan

Ji Şerovê Botanî qedirbilind ra!

Vê namê ji redaksiyona kovara "Roja Nû"-ra dinivise: Qurbaneliyê Ilyaz, Rojnamevan, endamê Yekitiya Rojnamevanên Sovyetiyên Sosvalist, berpirtsiyarê rûpela bona xwendevanên Kurdan, di rojnama "Ak Yol"-ê da, va ku li Komara Qazaxstanê derdikeve.

Di 7'ê meha îlonê sala 1990'i, li ser rûpelê rojnama qeza Çambûleyî "Ak Yol"-ê, para bona xwendevanên Kurda, bi sernivisa "Sibe"-ê va hate damezrandin. Di navbeynê da şeş meh derbas bû û evqas ji hejmarên rûpara "Sibe"-ê hat weşandin.

Birayê delal!

Me bi dil û ciger dixwest redaksiyona para "Sibe" û kovara "Roja Nû" bi hevra nêzik bûne girêdan. Em îro ji we ra du hejmaran dîşînin. Daha em ê her hejmarê rûpela "Sibe" ji we ra rêkin. Min ji dixwest her hejmarên kovara dewlemend "Roja Nû" bîşînim. Ji we hevî dikim ji min ra bîşînin. Ez wek rojnamevan dikarim ji redaksiyona we ra mîqale, hevpeyvîn, helbest û w.d. bîşînim.

Edî çi bîxivisim.. Bîminin sax û silamet.

Bi hêjayî qedirgirtina mezin, bi silavên alavî û qenc.



№7 | РУПАРА БОНА ХЭНДЭВАНЕД КУРДА РОЖНӘМЕ
МАРЗА ЦАМБУЛЕЙ „АК ЖОЛ-Е“

Qurbanliyê ILYAZ
3 Adarê sala 1991

Y. Sovyet

Ji redaksiyona Roja Nû ra,
Bî destpêka nama xwe ez bo
we karkirên redaksiyona kova-
ra Roja Nû û hemû hevalan
jiyaneke xweş û emreki dirêj
dixwazim.

Ez Casimê Cerdo, endamê
"Govenda Kurdi" ji Soviyetê.
Ez ji we ra notayên du stranan
dîşînim, yê ku gotinên wan
ji aliyê Keremê Angosi va
hatine nivisandin: "Lêxî
birano lêxî" û "Welat".

Lawkê me Kurda çend hejma-
rên Roja Nû dane min, ez ge-
leki pê kêfxweş bûm. Û hêvi-
dar im ku hûn dikarin her car
ji min ra Roja Nû bîşînin. Li
hêviya bersîva we me.

Casimê CERDO

Sıwiss

Hevalên delal û hêja,
Ez we ji dil û can piroz
dikim, li welatê Sıwissê ji we
ra silavên dilgermî bi
rêdikim. Ji xebata we ra ser-
kevtinek bîlind û hêja!

Ez hêvidar im ku hûn vê hel-
bestê di nav rûpelên Roja Nû
da bîweşînin.

Newroza we piroz be.
Bî silavên şoreşgerî.
Hertîşt ji bo azadiya
KURDISTANÊ!

B. BAWER

AZADI TU PIR XWEŞ Î

Şewq û şemal î
Tu evina dil î
Wek roja delal î
Azadi azadi tu pîr xweş î

Tu derd û xem û keder î
Kula dil û êş û azar î
Tu ew hesret î
Azadi azadi tu pîr xweş î

Tu rih û canê min î
Eşq û evina dilê min î
Tu kela xwina min î
Azadi azadi tu pîr xweş î

Tu evin û aşiti yi
Serfînaziya hertîşt î
Rojayê çajna piroz î
Azadi azadi tu pîr xweş î

Kesk û sor û zer î
Ala hawîr û jor î
Rojayê nû- yan Newroz î
Ji bo me gelek piroz î.

Şerê petrolê, Dinya û Trajediya Gelê Kurd

Dî rojên buhuri da şerê Xalicê rawestiya û Kuweyt hat rızgarkirin.

DYA ji bo ji dest revandina petrolê kete nava tirs û xofeke gelek mezın. Bî lez Yekitiya mîlettan cıvand û bıyarên lı dıji rejima Bexdayê hatın gırtın. Yekem bıyar ew bû ku ambargo bê danin. Lê pışti wexteke kın lı benda tesira encama ambargoyê ji nema û jı Yekitiya Milletan bıyara şer derxıst. Hemû welatên ku endamên Yekitiya Milletan nın jı ali politik, ekonomik û eskeri va pıšta xwe dane hev. Welatên sosyalit ji bî emperyalistan ra rınd ittifaq kırım. Jı bo ku Kuweytê (ya rasti petrolê) rızgar bıkın jı dest nerevinin.. Ev bıyar lı gor prensibên YM bû. DYA plan û listikên xwe zûda kırıbu. Bı propagandeyeke pırali raya gışti ya cihanê da bawer kırım ku ew jı bo prensibê YM û jı bo parastina aşıtı û azadiya mîlletan dıkevıne şer

Lê tu şık tune ye ku sebebên şer yê rasteqın tıştên dın bûn.

Dı dema şerê İran û Iraqê da hemû welatên dewlemend- çı yê emperyalist çı jı yê sosyalist - jı ber tırsa ideolojiya şıitiyê pıştgırıya Seddam kırım û ew dı mınıqê da xurt kırım. Welatên cınar bı dagırkına Kuweytê ketıne bı tırs û erışên Seddam. Jı bo ku DYA hım baweriyê bıde dewletên jı xwe ra döst, şêx û Qralên kevneperest hım jı petrolê jı destê xwe nerevine, vê carê şerê Seddam kır.

Gelê Iraqê ne dagırkına Kuweytê dıxwest ne jı şer. Xasıma gelê Kurd ê ku bı dehan sal e lı hember hukma Baxdayê şer dıkır. Pışti dawıya şer dı seranserı Iraqê da û her weha dı Kurdistanê da serhıldanekê gelemperi çêbû. Dı bajar û gundan da lı dıji hukma faşist a Bexdayê rabûn ser piyan.

Hêzên Kurd û Ereb nêzıki hev bûn, enıyeke freh çêkırım.

Kurdistan jı sedı nodûpênc hate rızgarkırım, welat kete bı kontrola Cepha Kurdıstani.

Ew pêşveçûyına lı gor daxwaza dewletên super

û yê ku Kurdistan dı nava xwe da parvekirıne nebû. Yekitiya Sovyetan û Dewletên Yekbûyi yê Amerika, İngilıztan, Tırkıye, İran, Suriye, Mısır û gelek welatên Erebi yê dın dane



xuyakırım ku ew lı dıji parçebûn û guhartına sinorên Iraqê ne. DYA jı işaretek dın da ku ew pêşkari şerê hundurin nabın û Iraq dıkare dı şer da balafırın jı bı kar bıne.

Durûti û xıyaneta DYA'yê êdı zelal dıbu. Ka hûn jı bo parastına heqên mirovati û prensibên YM çûbûn Xelica Farıs?.. Dıgotın ku em lı

mınıqê aşıtıyê dıparêzın. Me bı wê yekê tu wextekê bawer nekır . Dı dema şer da Bush bangı gelê Iraqê dıkır ku lı hember Bexdayê seri hıldın. Wexta ku dı şer da serkevtın, Bush gotınên xwe jı bira kır. Ew nuha dıxwazın Seddameki kedıkırı lı ser hukum be. Wê baştır bıbe, çımki qe nebe dıkarın bı reheti zerara şer jê bıstının. Hukmeki demoqratik wê lı gor daxwaza dilê wan nebe. Ev dıtın lı gor daxwazên dewleta Tırk û Farıs e jı. Pışti ku şer qedıya Seddam berê hêzên xwe yê mayi da Kurdistanê. Bêdengiya cihanê û Yekitiya Milletan jê ra bû pıştgırıyeke mezın. Balafır û bombeyên ku lı dıji hêzên Amerıkayê kar neanıbu, lı dıji Kurdan bêtırs bı kar anı. Gelê nav bajarın lı dıji tank û topan, balafır û bombeyan zayıatên gıran dan. Yê mayın berê xwe dan çıyan.

Nêzi 3 milyon Kurd jı welatê xwe hate qewırandın, berbı Tırkıyê û İranê kışıyan jı bo ku canê xwe xılas bıkın. Jı wana milyoneki zêdetır derbazı İranê , qısmeki jı bı zorê xwe avıtıne nava sinorê Tırkıyê. Bı sedhezaran lı serê çıyan dı bı berf û baranê da pêxwas, zıkê bırcı lı ber qırbûnê ne. Zarok, kal, nexweş lı serê çıyan hesreta gepek nan û cilek germ dıkışının. Kal û pıren Kurd, bırandar û nexweş bê kınç û cıl, bê xani , bê ar û dû, lı ber mırınê ne. Jın dı bıne berf û baranê da dıwelıdın. Zarokên ku nû tene dıne destra dımırın. Wek tê aşkerekirın rojê 2000 kesi zêde-

tir dımırın. Yê n dın ji dı dora mırınê da ne. Lê "parêzgerên aşiti û heqên mirovatiyê" lı cihanê û welatên xwedi dewlet lı hember trajediya gelê Kurd xwe kerr kırım. Fermana Kurdan rabûbû, Kurdistan careke dın ser û bin bûbû, gel dıxwest ku gaveki zû xwe ji welat dır bıxine. Bı ser da ağır dıbariya. Malbat ji hev belav bûbûn. Dê û bav, dayik û zarok her yek lı aliki mabûn. Seddamê xwinmij ji dıxwest ku Kurdistanê ji Kurdan vala bıke. Ev tışt bı plan dıhate meşandın. Ev barbariya han dı dirokê da bı qetliama Yahûdiyan û Ermeniyayan ra tê şıbandın.

İnsanên ku derbasi Tırkiyê û İraniê bûne ji negihıstıne rehetiyê, ji ber nexweşiyê û birçibûnê dı bin tehdida mırınê da ne. Xasıma dewleta Tırk lı hember penebarên Kurd tewreki pır bı neyarti dajo. Her çiqas bı propaganda û derewan raya gıştı ya cihanê dıxapine û xwe wek "xwediyê" Kurdan dıde xuyakırın ji, dı praktikê da ev ne wısa ye. Eskerê Tırk nahêle ku kesek berbi sinor gavekê bavêje. Xwarın, vexwarın, derman, çadır tu tışte nedaye û tu alikariyek insani nekiriye. Alikariyên ku dı nava gelê mınıqê da kom dıbe û yê n ku ji welatên Ewrûpi têne şandın hukumata Tırk dest dıde ser, yan ji pır bı derengi dıgihine wan. Serda ji rojê çend kes bı gulleyên eskerê Tırk têne kuştın. Bı kurti dewleta Tırk tenê dıxwaze ku ji vê rewşê istifade bıke, zêde alikari bıstine. Eger hukumata Tırk sinorên xwe ji wan ra negirtana û dan û stendına wan bı gelê mınıqê ra qedexe nekırana, wê iro rewşa wan çêtir bûna. Lê em rınd dızanın ku insanên ku ji Afxanistanê û yê n ku ji Bulgarya hatın, dewleta Tırk bı awaki pır baş ew xwedikırın. Huwıyet, pere, xani, kar ji wan ra texsir nekır. Lê ev dustandardi ji bo çı ye, baş tê zanın.

Pıştı heftekê rexnegirtına medyayê (rojname, radyo, TV), hêzên aşiti û demokratik tesir kır ku welatên Ewrûpi û DYA ji bo alikariya mirovati destê xwe dirêj kırım. Dı YM (Yekitiya Milletan) da hate rojevê ku lı hember vê problemê çı bê kırım. Yekitiya Milletan lı hember rewşa Kurdan xwe gıran kır. Lı gor mantıqê nûnerên wê, qelandına Kurdan karê İraqê yê hundırın bû. Heqên insani tenê ji bo insanên xwedi dewlet hebû. Diroka insaniyetiyê lı rûreşiyeye dın dıbû şahıd. Jı ortêrakırına geleki, Yekitiya Milletan eleqeder nedıkır û wan xwe kerr û kor dıkır. Lı hember cihanê rûreşiyeye mezin kır. Lê propaganda û rexneyên raya gıştı ya cihanê tesira xwe da xuyakırın. Fransı, İngiliz, DYA bêi bıryara YM ji bo

sekinandına erişên Seddam û alikariya insani hın gav avêtın. Lê YS, Çin, Kûba yê n ku navê sosyalizmê lı xwe kırine, lı hember bıryareke siyasi derketın û kırımên Seddam wek kareki hundırın ditın. Dı vê feleketê da Kurdan dost û dijminên xwe xweş ji hev derxıst. Welatên sosyalist ku gelê Kurd ew wek dostên xwe yê n nêzik dıditın, roleke ne baş listin. Baweriya gelê Kurd careke dın wında kırım. Filistiniyan ji baweriya Kurdan vala derxıstın. Dı nava tevgera Kurd da pıştıgıriya gelê Filistini bûbû sembolek. Lê em iro dıbinın ku PLO û serokên wan bê gotın lı ba faşistê Bexdayê cih dıgire û lı hember gelê me neyartiya xwe dıde xuyakırın. Dı bin çı perdê da be ji, ew nıkarın şovenizma xwe veşêrın. Em dızanın ku lı hember azadiya gelê Kurd, lı ba faşistan cih gırtın, ne lı gor berjewendiya (menfaet) gelê Filistini ye.

Iro ji lı Kurdistanı Başûr bı alikariya welatên İngiliz, Fransız û DYA ji bo Kurdan hın cihên azad têne amadekırın. Hukumeta İraqê ji ber vê yekê acız bû. Jı bo ku bıhna xwe bıhstine û propagandeyên ku lı dıji rejima Bexdayê hene qels bıke, ji serokên Kurdan ra pêşniyara hevditınê ani. Dı bin serokatiya C.Talabani da komiteyek çû Baxdayê. Pıştı çend rojan, dı 24.4 1991 da hate êlankırın ku wan lı ser otonomiya 11 Adarê ya 1970 lı hev kırıye.

Lê hevmaçkırına liderên Kurd û Seddam, ku dı televizyonê da ji hat nişandan, bı dilê tu Kurdeki walatparêz nebû. Seddam bı vi şıklı lı hember cihanê bı wesıta serokên Kurdan qetilkariya xwe da bexşandın!..

Nûnerên Kurdan, ji bo çüyina Bexdayê lez kırım. Jı ber ku heya hın garanti û pıştıgıriyên navnetewi neyên gırtın, parastına otonomiyê geleki zehmet e. Dıkarıbûn guftûgoyan lı bajarêki Awrupayê çêkırın, ne lı Bexdayê. Vê yekê ji dıkarıbû problema Kurdi zêdetır bine platforma navnetewi. Ya dın heta ku lı İraqê demokrası bı ser nekeve, lı Kurdistanê parastına otonomiyê geleki zehmet e. Jı ber vê yekê ji heya ku garantoriya YM tunebe, iro nebe sibê, Seddam nebe diktatoreki dın, wê rojekê bıbêje ku otonomi ne bı dilê mın e û wê ji ortê rake. Aşkere ye ku pırsa Kurdan, pırsa neteweyeki 30 milyoni ye û pırseke politik e. Dıvê jêra çareke politik bê ditın. Çare ji ew e ku, wek hemû neteweyên dın gelê Kurd ji qedera xwe bı destê xwe çareser bıke.

Redaksiyon

Derewên bêbini:

"Serbestiya" Zımanê Kurdi û Newrozê

DILSOZ

Beyana "serbestkirina" zımanê Kurdi li welat û dervayi welat deng da. Çapemeniya Tirk û derdorên siyasi, ev beyana han, wek guhartina siyaseta dewleta Tirk nişan dan û munaqeseyeke bê serûber dest pê kir. Hetta him li welat û him ji li dervayi welat hinek derdorên siyasi, dest bi pesindana hukumeta Tirk kirin û vê beyana derewin wek "gaveke maqûl" dan xuyan.

Bî şerê Xelîcê ra li Tirkîyê gav bi gav, roj bi roj, hetta saet bi saet siyasetên guhêrbar hatin meşandin. Li ser qedera gelê Kurd, di navbera dewletên dagirker (Tirkîye, Îran û Sûriye) da trafik sîxlet bû. Li dû hev beyan hatin dayin û li pêşiya Kurdîstaneke serbixwe bend hatin lêkirin. Ji bo paymalkirina Iraqê û bî taybeti ji Kurdistanê hesabên bazirgani hatin ajotin.

Li alî dîm Amerika û hevalbendên wi stratejiya vi şerî û encama wi zûva kifş kiribûn, ji bo piştgiriya welatên Ereb û yê dîm şerbet belav dikirin. Şerbeta wan zêdetir ji, devê dewleta Tirk bî av dikir. Lê gotineki pêşiya heye ku dibê: "hesabê malê û sûkê li hev neniherî". Ango dewleta Tirk zend û bendê xwe ji bo şer bada û kete xewn û xeyalên bîdestxistina Kurdistanê, bî taybeti ji Mûsil û Kerkûkê. Lê ji % 90 gelê Kurd û Tirk li dîji şerxwaziya dewleta Tirk derketin û bûn astengeke mezî li pêşiya planên şer.

Piştî pûçkirina vê planê, dewleta Tirk kete dû heqê garantoriya ser Kurd û Tirkmenan. Ango wê li Iraqê dewleteke federatîv bihata saz kirin (ji Kurd, Ereb û Tirkmenan) û wê Tirkîyê ji li ser komarên Kurd û Tirkmenan bîbûna garantor. Tam ji di vê demê da serbestkirina zımanê Kurdi û cejna Newrozê ji alî serokdewletê dewleta Tirk va hate beyankirin.

Wek tê zanin di sala 1983'an da bî qanûna 2932'an, bikaranina zımanê Kurdi bî her awayî (di perwerdegari, çapemeni, axaftin, radyo, televîzyon, perwerdegari, cîvin, xwepêşandan û hwd.) hatibû qedexa kirin. Lê di praktikê da vê qanûnê û hemû cûreyên zordesti û tehdîdê pêşî li axaftin û nivisandina zımanê Kurdi negirt.

Divê bête zanin ku, berya vê qanûnê ji

zımanê kurdi û çanda wi di bin zincîrên qedexeyan da bû. Ji ber vê yekê rakirina vê qanûnê wê guhartineke radikal bî xwe ra neyne, lewra zımanê Kurdi bî gelek qanûn û bendên dîm (wek bendên 26 û 28) qedexekirî ye. Û bî rakirina qanûna 2932'an, ne pîrsgirêka Kurd çareser dibê ne ji zordestiya ser çand û zımanê Kurdi radibe.

Dem a ku behsa "serbestkirina zımanê kurdi" tê kirin, serbesti tenê ji bo axaftina nava malê ye. Ev "serbesti" ji alî hukumeta Tirk va weha di hate şîrovekirin: "*Gava em behsa serbestkirina zımanê Kurdi dikin, divê van nuqteyên han ji çav neyên dûr kirin! Wê bî vi zımani neyê nivisandin, di perwerdekirin, radyo û televîzyonê da neyê bikaranin, di cîvin û xwepêşandan da, komel û sendikayan da, li cihên fermî û dadgehan da neyê axaftin, pirtûk, rojname û kovar neyên çapkirin...*" û gelek astengên dîm. Ji dervayi vana tenê ciheki axaftinê dimine, ew ji tenê malê ye. Bî vê "serbestiyê" ra wê li Kurdistanê seferberiya perwerdekirina zımanê Tirkî ji dest pê bike, angê wê siyaseta asimilasyonê bê qewikirin.

Bî kurti armanca beyana "serbestkirina zımanê kurdi" ji melaqî û xapandinê pêştir tişteki nine. Ozal ji bo hesabên ser Kurdistanê Iraqê, ji bo berpîrsiyariya (hamitî) Kurdan, ji bo hesabên hîlbijartinê, ji bo xapandina muxalefeta welat û dervayi welat, ji bo xapandina saziyên navnetewî yênsani û demokratîk cambaziyê dike. Jixwe durûtiya Ozal û dewleta Tirk di rakirina vê qanûnê da baş kifş bû. Ew vê qanûnê rakirin lê bî "qanûna terorê" gelek astengi û dijwariyên nû derxistin pêşiya tevgera gelê Kurd û zımanê Kurdi.

Di beyana serbestkirina zımanê Kurdi da tenê tişteki balkêş hebû, ku ew ji ji 70 salî vîrda bî deveki fermî qebûlkirina hebûna gelê Kurd û zımanê wi bû.

ÇIROKA "SERBESTKIRINA NEWROZÊ"

Ji berê va Newroz bûye tîrsa xewnên dewleta Tirk. Her sal berya 21'ê Adarê deşt, çiya û kola-

nên Kurdistanê bî esker û polêsên dewleta dagirker va tên dagirtin. Ji bo pêşgirtina pirozkirina cejna Newrozê hemû cûre êriş û zordesti li dara dikeve. Agirê Newrozê, tevi ewqas barbari ji, sal bî sal geştir dibe.

Êdi dewleta Tirk ji dizane ku zordesti, zindan û êşkence nikare pêşi li pirozkirina cejna Newrozê bigre. Icar bî şerê Xelîcê ra, formulek ji bo vê pîrgirêkê ji hate ditin. Dî meha Adara 1991'i da pirozkirina Newrozê bî awayeki fermi hate "serbest kirin." Ev bîyarnameya pirozkirina Newrozê ji me Kurdan ra balkêş nehat, lewra me dizanibû ku ev bîyar parçeki plan û dezgeyên jorê ye.

Balkêş e, ku Newroz bî destana Ergenekon va tê girêdan û wek cejneke netewî ya Tirkan tê şirovekirin. Balkêş e, ku him Newroz dibe "cejna netewî ya Tirkan" him ji tenê li dibistan û


xwendegehên Kurdistanê tê piroz kirin. Çima ne li seranserî Tirkîyê? Balkêş e, ku ev cejn tenê li xwendegeh û dibistanên Kurdistanê û bî seminer û konferansan tê "piroz kirin." Balkêş e, ku ev cejn di radyo, televizyon û rojnameyên Tirkan da nayê piroz kirin û behs kirin. Balkêş e, ku cejna Newrozê ji alî Wezaretê Perwerdegarî va tê organizekirin. Û balkêş e, ku di Newrozê da bî dehan insan hatin kuştin û birindar kirin, bî sedan ji hatin girtin.

Wek rojê eyan e, ku ne dewleta Tirk ne ji xelkê wi bî vê komediyê ne bawer in. Lê ji bo hevladîna Kurdan, dewleta Tirk dikare her rezili bîke û bîkeve her rengî. Em pêwîst nabin ku li ser vê meselê bîkevî munaqeseyekî, lewra ker û kûçik ji bî vi reziliya dewleta Tirk dikene û ji van çirokan vedireşe.

Welatparêz û nivîskarê Kurd

SEIDÊ İBO

hat kuştin



Prof. Dr. Seidê İbo, di 18.1.1991'an da li nexweşxana Yêrêvanê bî destê xwinxwaran hat kuştin. Seidê İbo, li vê nexweşxanê doktorê zarokan bû. Ew him wek doktor, him ji wek nivîskarekî welatperwer bî nav û deng bû. Dî nav Kurdan da gelekî di hate hezkirin. Kuştina wi wek xebereke reş, di nav cîmaeta Kurd da zû belav bû. Dost û pîzmemên wi, heval û hogirên wi yê Kurd û Ermenî 3 rojan şîrî danin û reş girêdan. Bî hezaran Kurd û Ermenî ji

malbata wi ra serxweşî xwestin. Dî hîldana cînyazê Seidê İbo da, ji 10 hezari zêdetir kes beşdar bûn. Dî goristana Kurdan da (ku 25 km. li dervayî Yêrêvanê ye) hat binaxkirin.

Seidê İbo, di 8.5.1924'an da li gundê Cirarâtê nehiya Êçmiyazînê hate dinê. Dîbîstana pêşîn li gund xwend û paşê çû Yêrêvanê. Dî sala 1957'an da li Universita Yêrêvanê Fakûlta doktoriyê kuta kir. Dûra çend salan li gundên navçaya Sîpîtakê doktori kir. Wê wextê wi dest

bî nivîsandina helbest û kurteçirokan kir. Nivîsên wi di rojname Riya Teze da derdiketin. Dî sala 1966'an da pirtûka wi ya kurteçirokan, bî navê *Duryan* hat çapkirin. Û bî navê *Kurdê Rêwî* romaneke wi ji di sala 1979'an da derket.

Bî kuştina Seidê İbo, gelê Kurd ewladêkî xwe yê hêja winda kir. Em ji malabata wi ra sersaxiyê dixwazin.

Dî hejmarekê din da emê kurteçirokeke Seidê İbo bîweşînin.

Roja Nû

ROJEKE ZIVISTANÊ LI DEŞTA BARGIRI

BARAN

Deşta Muradiyê ji geliyê Bendimahi dest pê dîke û ber bi rojava heya Gola Wanê dirêj dibe. Sê aliyê din, hawirdor wek gerdaneki bi çiyayî va girîye. Çemê Bandimahi van çiyayî lî hêla Rojhilata Bakûr dibire, diqelêşe. Ev geli Muradiyê bi Çaldîranê va girê dide.

Muradiyê di devê vi geliyê da ye. Navê xwe yê kevn Bargirî ye. Dibe ku eslê xwe "Barkirî" be. Xuya ye navê Muradiyê piştra lê kirine. Xelkê vê dorê, angî Kurdê me jê ra dibêjin Bêgîrî. Di Kurdistanê da gelek cih hene ku bi vi awayî du, heya sê navên xwe hene.

Bajarê Bargiriyê, cara pêşin ku min dit wek gundekî mezînbû. Lê xuya ye, bajarê kevn e. Di tenîştê da lî ser gîrê mezînbû û bilind Kela Bargirî xuya dîke. Ji Êrtartûyan maye. Kela ci û ci hilweşiyayê bûye pag, lê hin diwarên wê hin ji lî ser lîngan in.

Di vê deştê da, ber bi rojhilatê, di navbera Bargirî û gundê Korsotê da kelayeke din heye. Gor dirokzanan ew ji dema Êrtartûyan maye. Lê xelkê wan gundan jê ra digotî Kela Şahîsmail. Gor çirokên wan, şerê Şahîsmail û

Erebozengî lî pêşê vê kelê çêbûye.. Dibêjin Erebozengî di vê kelê da veşartî ye. Lê çirokên han lî Kurdistanê lî pîr çiyayî hene. Gora Şahîsmail û Erebozengî ji..

Tu dibêji, di tenîştê vê deştê da ev girê han ji bo kelayeke usa bilind bûye. Kela hilweşiyayê, lê wexta ku min dit, lî hêla rojhilatê diwarên wê ku ji deştê dest pê dikir û heya serê girî bilind dibû, hin lî ser xwe bûn. Meriv ecêb dîma, ev kevîrên reşî mezînbû û xweşik birî, ku heryekî belkî pênc ton, deh ton dikîşand, di dema berê da çawa anî bûn û çawa hîlkîşandî bûn wê bilindahiyê û ev kela ava kirîbûn..

Lê ev diwarê hêja û xurt ku heya vê rojê baş ber xwe dabû, dibe ku ji hezar salan derbaz bûbû hatûbû, nuha di xetereke mezînbû da bû. Mutehidan, van merivên çavbirçî çavê xwe berdabûn van kevîran, berekî va hûr dikîrin, dibîrin.. Û di guhê kesî da ne bû. Ew efrandîna diroki û hêja bêxwedî bû.

Gundiyan digot, wexta berê lî serê vê kelê bajarê Ermenîyan hebû. Di vi bajarê biçûk da

ci hebûn bo çêkırına şeravê û helandina rûnê don.

Carê-du caran derketim jor, nihêrim. Ne malan xuya dıkir, ne ji tışteki dın. Nişan hene wek ciyekî xırabe ye. Lê herhal gelek zû da betal bûye û gêziya zeman usa ji ser derbaz bûye ku avayî û tışt lî ber çavan nehîştîye.

Dı gundên dorê da, dı berwarên çıyan da coyên avê yê mezın ji hene ku dibêjin ji Ūrartûyan mane. Lê iro ji bo avdanê bî kar nayên. Ci û ci xırab bûne, ci û ci wek newaleke av pê ra dikişê. Lî vê hêlê, lî gundên Kurdan pıranî pez xwedi dıkin û guh nadın baxçe û bostanan. Ew, herçiqas lî deştê ceh û genım dıçının ji, ne wek Ūrartûyên sê hezar sal berê hewcedari coyên avdanê ne. Ew bî tıştên han serê xwe naêşının û barana ku dibare besî wan e.. Dewlet û hukumeta tırk ji lî vê mıntıqê, tenê tehsildar e, cendırme ye, zindan e, lêdan e. Dı alî avayî û bajarvaniyê da ha heye ha tune..

Lî alî rojhilatê û başûr çıya ne ewqas bılındın. Lê hêla bakûr çıyayên gelek bılınd û asê hene. Çıyayê Tendûrikê bî ser hemûyan ra bılınd dibe. Ew, ji qıraxê Gola Wanê dest pê dıke, bî hın mılên xwe va dirêj dibe, dıgihê Agıriyê mezın. Pır caran havına dereng lî ser berf heye, dı bın roja havinê da ji dûr va dıçırise. Hın caran serî bî mij e, pûk û baran e.

Çırokên van çıyan hene. Çırokên şên û yê xemgin.. Lî ser nêçır û nêçırvanan, lî ser qulıngan û pezkûviyan, lî ser dılan, lî ser mêrani û şer.. Yek ji wan çıroka Geliyê Zilan e ku bî "çıl û çar gundan" va hat şewıtandın, hemû insan û pez va hat qırkırın.. Nuha lî wi geliyî û zozanan disa kulilkên rengin vedıbın û têr giya heye, pez dıçêre. Lê pezê dewleta zordest e. Geliyê Zilan êdî ne warê Kurdan e.

Çemê Bendimahi ji Çaldıranê tê û ji deşta Bargırî derbaz dibe, dıgihê Gola Wanê. Havin û zıvıstanan wek newaleke bıçûk e. Lê bıharê, bî ava berf û baranê gur û geş dibe, dibe çemeki mezın. Hingê dı ava wi da têr masî dıbın. Ava golê bî soda ye, masî pıranî dı qıraxê wê da lî devê çeman çê dıbın ku av lî wir heya dereceki şırin û zelal e. Dema bıharê ava golê bılınd dibe xwe dıde devê çeman, Hingê masî ji ji vê ava sodayî dırevın û dı çem û newalan da ber

bî jor hıldıkışın.

Hingê dema nêçıra masıyan e. Xelkê dorê bî zembilan dıçın nêçırê. Zembila xwe dı ava şêlî da dıkin û dıkışının, tıji masî ye.. Masıyên xwe gelek tamdar ın. Gundi, her usa ji wan hışk dıkin, xwê dıkin û dıparêzın bo zıvıstanê.

Gola Wanê dı vê mıntıqê da ber bî rojhılata bakûr wek şûreki dirêj dıbe, dıkeve deşta Bargırıyê. Ev der ciyê zilan û çûkên avê, qaz û werdekan e.

Havınan dı çıya û zozanan da têr giya heye, pez û insan tê da wında dıbın. Zıvıstanan berf gelek dibare, erdê dıpêçe û serma xurt e. Dı navbera Çaldıran û Gola Wanê da, lî geliyê Bendimahi tım ba û bager heye, çem qeşa dıgre. Lî wir pır caran rêwingiyên bê tevdir dıcemıdın, an poz û guhê wan dıweşê. Leşker pır caran dıji sermayê poz û hunarıkên xwe tenî dıkin.

Xeteki hesın ji (xetê dekowilê) ji alî Çaldıran tê, heya ber Gola Wanê dirêj dıbe. Ew ji dı Şerê Mezınî Pêşın da bî destê Ūrısan hatiye çêkırın. Leşkerê Ūrıs bereki va şer kıriye, bereki va rê û pır çêkırıye û hatiye. Lê pıştı veğera wan xet betal bûye. Ewana dı nêzi gundê Korsotê da ji bo nıftê bir ji kolane.

Sala 1955, dawıya payızê, destpêka zıvıstanê bû. Lî ser qamyoneke vekırî em bî rê ketın. Qamyon ji Bargırıyê dıçû gundê Korsotê, ji bo mekteba nû malzeme dıbir. Ez dersdarê gundê Korsotê bım, ji bajêr vedıgerıyam gund. Berê êvarê bû.

Lî ser qamyona vekırî em çend zılam û du jin bın. Cılên jınan ne wek yê gundiyan bû, herdu ji dı bın çarşefê da bın. Lî erdê berfeke tenık hebû. Baki sıvık lê sar dıhat, bî beza makınê xurt dibû û rûyê me dışewıtand. Riya me ne ewqas dirêj bû, heya niv saet-çıl deqqe emê lî gund bana.

Makine ji orta deştê, ji nêzıki gundê Ūtê derbaz bû û berê xwe da Korsotê. Lê pır neçû dı newalekê da ket heriyê, sekını. Jı du jınan pêve em hemû hatın xwar. Me makine tan da,

ji der û dor kevır û giya kışand û dani heriya pêş teker, lê çı kır, çare nedit. Muxurbe kete erdê. Gundê Ûtê, bı peyati, 15-20 deqqe wê da bû. Şofêr got, "emê vê şevê lı gund derbaz kın û sibê bên makinê derxın. Heya sibê belki erd bıcemide û makine rehet derbaz be."

Merivek wek novedar lı ciyê şofêr hıştın, qapûteki xurt û şeşarek danê û em hemû ber bı gund bı rê ketın.

Êdi şeverêş bû. Bayê sar xurt dihat. Ew herdu jin çend gáv bı dû me bûn. Merivek, jê ra dıgotın Zênel, yeki dor 30-35 sali, nızam çıma, hêrsa xwe bı wan du jınan dani, weki dı rûbari wan da karê me rast neçûye û em dı rê da mane.. Bı hêrs jı merivê cem xwe ra dıgot û mın dıbihist:

"Hemû dı rûbarê wê cınabetê da ye!"

Ku em gıhıştın gund kûçık hatıne me. Xasıma yeki reşole û har pêşira me berneda, hındık mabû bı me bıgire. Zênel jı lodekê destiyek zil kışand, êrişı ser kûçık kır û ew revand, da pêş xwe, bır kır kadinekê û deri lı ser girt.

Yek-du gundi derketın pêş deriyan. Pırsın em ji ku tên û çı mesele ye. Pıştra em lı malan par kırın û ez û Zênel û yeki dın, em hersê çûn mala mixtêr.

Çawa em dêri da ketın hundır, lı oda mixtêr germê lı rûyê me xıst. Ser kulavan jı me ra balgi raxıstın û me xwe rehet kır. Zû çay hazır kırın û pê ra nan û penir anin.

Lı hêla Wanê, mina hemû serhedıyan, nin dı tendûrê da dıpêjin û meriv jı tama wi têr nabe. Penira wan jı giyayeki tevlê dıkın ku tameke xas dıde vê penirê.

Xelkê vê dorê çayê zehf vedıxwın. Herçi ku hal û wextê wan baş e, semawera wan tım lı ser êgir e. Wi zemani çay û şekırê wan jı İranê dıhat. Şekır bı qalıwên mezm bûn û bı kerpetenê dıhatın hûrkırın. Bereki va semawer dıkele û bereki va malxweyê malê, kerpeten dı dest da hêdi hêdi şekır hûr dıke, hazır dıke. Weki bı vi tıştı gelek kêfa wi tê. Bereki va jı qutiyên tıtûnê yên zivin lı ser kulavan ra xıj dıbin, dıçın tên û suhbet şirin dıbe.

Tevi mixtêr, bırayê wi ye xort û du gundiye

dınê ji dı odê da bûn. Dema suhbetê da ewana kıvş kırın ku Zênel dengbêjeki yeman e. Êdi lı ber dılê wi geriyan ku çend kılaman bêje. Lê Zênel xwe gelek bı naz dıkışand. Jınan jı ev gotın bıhistın û tevi zar û zêçên xwe jı ciyê malê, ango jı hêla tendûrê derketın hatın. Ew jı lı rawera Zênel dıgeriyan ku bêje. Ewana hev û du gelek bırın û anin, lı dawiyê Zênel razi bû, dest avête guh..

Zênel dest pê kır û cardın dev jê berneda! Ewi heyra derengê şevê got. Klamên wi dirêj bûn, lı ser mêraniyê û lı ser dıla bûn. Carcaran gotın bı dû hev, bı lez derdıkettın, te dıgot makineli ye dıxebite. Carcaran deng dı qırıka wi da dirêj dıbû, weki pelê deryayê, hiltê û datê.. Deng carcaran usa nızım, diheliya, wında dıbû. Lê dema ku wi bıhna xwe dıstend û jı nû va bı xurti dest pê dıkir, hıngê axın dı qırıka wi da wek teqinekê derdıkett, zarokên ku hımbêza dıya xwe da raza bûn vedıcenıqın û cardın dıketın xewê. Bûk û jınên ku ber bı deri rûniştı bûn çavê wan tım lı dengbêj, devê wan pıçek vekırı, heyran heyran guhdari dıkırdın, xwe ber bı pêş û paş dıhejandın û te dıgot dı wê saetê da hemû derd û pırsên dınyayê jı bır kırıne û dı wê kılame da heliyan. Mêran jı carcaran "herê herêê!.." dıgotın.

Zênel yek xılas kır, dest bı ya dın kır. Êdi ne hewce bû ku kes jê ra bêje. Ez ecêb mam: wi çıma dı destpêkê da xwe ewqas şunda dıkışand? Xuya ye ew jı usûla dengbêjiyê bû.

Dema ku Zênel xılas kır belki nivê şevê, belki jı derengtır bû. Xwediyê malê û cıranan nivinên me raxıstın, "şeva bı xêr" gotın û derketın. Em westiyayi bûn, zû dı xew da çûn.

Sibê zû em rabûn û bı rê ketın. Gava em hatın cem makinê, hevalan jı novedar pırsın:

"Şeva te çawa derbas bû?" Ewi got:

"Wellahi ne baş! Qet xew neketiye çavê mın."

"Çıma, tu tırsiyayi?"

"Na, ne tenê jı tırsê.. Lê tırs jı heye! Pıştı çûna we, mın demeki kılaman gotın. Pıştra hiv derket. Hiveroneke delal bû.. Nişkava zurbeki gur dora makinê gırdın. Heya sibê lı dor me hatın û çûn, zûre zûra wan bû. Pıçek berê, kınge şeva qê lêxıst û ronı bû, ber bı ciyê dır ketın çûn." Yeki jê ra got:

"Te çima bernedayê, ma şaşara te hebû?"

"Ma deri ji wan ra vekim bo wan hêsani be? Yan camê bîşkinim?"

Hemû bî hevra kîrîn teqîn û kenin. Bo xebitandina makinê kar dest pê kir. Lê vê car problemên din derketin. Mîn dit ku kar dirêj dibe, xaturê xwe ji wan xwest û bî rê ketim. Gundê Korsotê li himber, li quntara çiyê xuya dîkir. Riya saetekê bû. Ta ji zarotiyê ez ji meşê hez dikim.

Hewaki xweş bû. Ezman vekirî û ba tune bû. Roja sibê hin nuh ji ser çiyên ra dabû deştê. Deşteke rast bû wek belgê kaxizê. Ne newalek hebû li ser riya mîn, ne ji gîrek. Mîn fitik dukuta, klam digot û dîçûm. Xorteki hijdeh sali bûm..

Mîn riya gund nêvi kîrî bû, lê hin ji makinê xeber tune bû. Ketûbûm xeyalan. Nişkava qasi sed mêtro wê da li pêş mîn û li dora rê kevirên gewr xuya kîrîn, wek kevirê goran.. Lê pê hesim ku ne kevir in, gur in.. Qasi neh-deh heb.. Hinên wan li ser çar lingan in, hin li ser du lingê paşin wek kûçikan rûniştine, li ciyê xwe sîkînine, nalivîn.. Hat bira mîn tîştê ku novedar gotûbûn.. Gurê birçî ne, yê ku îşev ji çiyê daketine û hin derneketine çiyê..

Weki dilê mîn tikiya û germiyê da rûyê mîn. Lê di navbera me da êdi sed mêtro ji nemabû. Rê, qasi menzila 30-40 mêtroyi nêzik ji ber wan derbaz dibû dîçû.

Di demeke kurt da mîn biryara xwe da: Divê ez xwe şaş nekim, nesekinim û nerevim. Çirokeke Stefan Zweig hat bira mîn. Rojeke zivistanê jin û mêrek di paytonekê da ji êrişa guran çawa xilas bûbûn.. Lê wan, erebe, hesp û tîfinga wan hebû. Tîm agir dîkîrîn û gelek gur dîkuştin. Disa ji guran hindik mabû pêşi li hespê bîbirîn. Hîngê tîşteke hat bira wan, nişkava agir sekîrandin. Gur bî vê guhartinê ecêb man û sekînin. Hîngê hesp di vê firsendê da bî pêşket, ji xelesa guran xilas bû û heya ku hişê guran hat serê wan, cardin bî dû erebê ketin, wê gelek rê stend û rêwingiyên me xilas bûn.

Lê yê mîn ne hesp hebû, ne ji tîfing. Mîn got, divê ez tîşteki ecêb bikim! Yek ji, gava kûçik tene merivan eger darek hebe û bî dû xwe bîkişîni ew bî dû wi dari dîkevî û

nîkarin xwe bavêjin te.. Lê çoyek ji di destê mîn da tune bû. Ez weki vê roja zivistanê li deşta Mûradîyê wek tûristeki li kuçeyên Enqerê bûm, bê xem û bê tevdir.

Bo vegeerê êdi dereng bû. Mîn riya xwe ji neguhart. Saqoyeki tenik li mîn bû. Ew ji ya apê Meho bû, mezinê wê mala ku ez lê dimam. Sakoyeki nû û paqij bû. Wi li ser nîmêj dîkir. Sibê ku ez derketim da mîn û got "tuyê necemîdi." Mîn ew derxist û bî pişt xwe erdê ra kîşand. Berê xwe dabû pêş û di bin çavan da li guran dînihêrim. Ji ber wan derbaz bûm çûm. Te dîgo bî rasti ji keviran çêbûne, qet yek ji ciyê xwe nelîvi. Weki ecêbmayî bî çavên xwe yên zûrkîrî li mîn nîhêrin û usa man..

Nêzi gund bûm, di bin gund da keriyek pez dîçêriya. Ji ber ku hin berf tenik e û giyayê hişkbiyî li ser xuya dîke, pez li der e. Gundi, heya berfa stûr ket û hertîşt di bin da wînda bû pezê xwe dîçêrinin. Pîştî wê heya Nisan-Gulanê pez di hundir da ye, bî giyayê lodan idare dîke.

Nêzi keriyê bûm ku şivan di derheqa guran da hişyar bikim. Ji dûr va mîn deng li şivan kîr û got:

"Hevaloo, haya te hebe, gur hene!" Bî destên xwe ji mîn nişan dîda.

Lê icar kûçikan xwe avêtin mîn. Şivanê bom ji dînihêri û dîkeniya. Andêran hindik ma li ciyê guran ew mîn parçe bikin! Disa mîn sako hejand ku xwe pê bîparêzîm. Lê kelpan sakoyê mîn dîrandin. Êdi şivan ra mîn da kîfriyan:

"Kuro tu çî kereki bom i, gazi kûçikan bike da!.."

Şivanê famkor li dawiyê aqil kîr, kûçik dan sekîrandin. Mîn xeberê dinê jê ra gotin. Lê ne di bira wi da bû. Dibe ku bî gotinên mîn bawer ne dîkir; yan ji, ji ber kelpên usa har, tîrsa wi ji guran tune bû..

Sako di yek-du ciyan da dîrandibûn. Herçiqas ciyên dîrandî ne ewqas mezin bûn û jinan ew dirûtin ji, Apê Meho cardin pê nîmêj nekîr. Ji ber ku devê kelpan lêketî bû û êdi ji bo nîmêjê heram bûbû..



Helbestvan û welatparêzeki mezin bû...

MAMOSTA HEJAR

□ Dîl û qelema Mamosta Hejar nêziki 50 salan bona azadiya Kurdistanê lîviya. Heya roja mîrînê ji...

□ Ew ji aliyê Qazi Mihemed va wek şairê netewî hatibû nasandin.

Şairê bî nav û deng ê gelê Kurd, Mamosta Hejar dî 70 saliya xwe da çavên xwe li jiyânê girt. Mîrîna wi dî nav dost û hevalên wi da, dî nav gelê Kurd da êş û dîlxemiyeke mezin peyda kir.

Navê wi yê rasti Evdîrehman Şerefkendi ye. Dî sala 1920'î da li *Mehabadê* hatiye dinê. Bavê wi Mihemed Şerefkendi mella bû. Evdîrehmanê piçûk li ba bavê xwe dest bi xwendina medresa dini kir. Ew ji wek gelek edîb û ronakbirên Kurd yê sedsala bistan, dî medresa dini da gihîştîye. Wi bî dirêjayiya salan fikîr û ramanên welathîziyê dî nav civata Kurd da belav kir. Dî nav şerê rîzgariya netewî da bî peşmergeyan ra bû; bî Qazi Mihemed û Barzani ra heval bû..

Hejar beri damezrandina Komara Mehabadê dest bi nîvisandinê kiribû. Wê çaxê ordiya Sovyetê bî demi ketibû Kurdistanê û Azerbeycanê û ji ber hindê ji bandora hukumata Îranê şkestibû. Zulma şahê Îranê li ser gund û bajarên kurdan hatibû rakirin. Li Kurdistanê mecalê hişyarbûn û xwe rêzkirinê peyda bûbû. Gelê Kurd ji bo darxistina jiyaneke azad, ji bo



Hejar (Evdîrehman Şerefkendi)

rîzgariya netewî bî lez dest bi avkirina saziyên netewî kir. Dî navbera salên 1941 û 1947'an da gelek rêxistin û komeleyên siyasi û ferhengî hatin damezrandin. JÊ- KAF (Komele Jiyanewey Kurd) yek ji wan e ku Hejar ji endamê wê bû. Dî van salan da, wi gelek helbest nîvisin. Dengê wi dî nav gel da belav bû. Diwana wi ya pêşin "Alekoke" dî sala 1946'an da ji aliyê dewletê (Komara Mehabadê) va hat çapkirin û belavkirin. Serok Qazi Mihemed bî awaki resmi du şairên mezin wek şairên Kurdi yê mîlli nasandin, ku yek ji wan mamosta Hêmin û yê din ji Mam Hejar bû.

Piştî rûxandina Komara Mehabadê Mamosta

Hejar ji Kurdîstana Îranê derbasi Kurdîstana Iraqê dibe. Demekê li bajarê Silêmaniyê li cem kurê Şêx Mehmûd Berzenci Şêx Letif dimine. Dûra diçe Bexdayê. Jiyanêke derbederi û gelekî dijwar derbas dîke. Bî nexweşiya tuberkulozê dikeve û ji bo tedaviyê diçe Lubnanê. Du salan li wîra dimine, lê carna diçe Suriyê. Pey derketina nexweşxanê diçe Suriyê û sê salan li wîra dimine. Dî wan salan da Mam Hejar li ser fêrbûna zîmanê Erebi û Kurmancî dixebite. Dî sala 1958'an da disan vedigerê Iraqê. Hingê Barzanî û hevalên xwe ji ji Sovyetê vedigerin welat. Ji ber azadiyên desketî, Mamosta Hejar kar û xebatên xwe yê çandî û siyasi pêşda dibe. Dî rojnama "XEBAT" (organa Partiya Demokrat a Kurdîstana Iraqê) beşa Kurdi da dixebite. Piştî peymanê 11'ê adara 1970 Mamosta Hejar ji bo serokatiya Yekitiya Nivîskarên Kurd tê hilbijartin.

Dî warê çand û edebiyata Kurdi da xîzmeta

Mamosta Hejar gelekî mezin e. Ew bêtir wek şair hatiye naskirin, lê rojnamevanî, xebatî li ser ferhengan (berhevkirina gotinên Kurdi) û wergêrî (tercumani) ji warên serfiraziyê ne ji bo Mam Hejar. Dî wextê Komara Mehabadê da, dî derxistina rojnama "KURDISTAN" û kovara "HELALÊ" da ji keda wî mezin e.

Heta niha nêzîkî 20 berhemên wî hatine çapkirin û belavkirin. Em li jêrê navê hin xebatên wî yê çapkirî didin:

- ① Alekoke (diwan)
- ② Şerefname (vegera ji Farisî)
- ③ Mem û Zîn a Ehmedê Xanî (Vegera zaravê Soranî)
- ④ Ferhenga Kurdi-Kurdi û Kurdi-Farîsî
- ⑤ " Bo Kurdîstan" (diwan)
- ⑥ Çarinên Omer Xeyyam (vegera Kurdi)
- ⑦ Diwana Melayê Cîzîrî (Bî şîrovekirin)

HER KURD IM

*Be derbederi yan le mali xom
 Le xaki Ereb, le Îran û Rom
 Kok û poşte bîm rût û recal bîm
 Koşîm dehqat bê, wêranemal bîm
 Aza û rîzgar bîm, şedan û xendan
 Yan zincîr le mîl, sûci zîndan
 Sax bîm, cihêl bîm goy suwanan
 Yan sax û nîzar le nexoşxanan
 Danîşîm le ser textî xwendekarî
 Yan li kolanan bikem hejarî
 Kurd im le reyî Kurd û Kurdîstan
 Ser le pênav im, giyan le ser destan
 Be Kurdi dejîm, be Kurdi demîrîm
 Be Kurdi deydem werami qebrîm
 Be Kurdi disan zîndû debîmewe
 Lew dînyaş bo Kurd tê heldîçîmewe.*

HEJAR

Bexda 11.10.1948

DEKLERASYONA KONFERANSA STOCKHOLMÊ

Dî navbera 15-17 Adarê 1991 da li Stockholmê, li ser pîrsa kurdi konferanseke navnetewî hate civandin. Konferans ji alî "Komîta Swêdê ya Mafên Însani Ji Bo Gelê Kurd" hate organizekirin. Dî civînê da nûnerên partî û rêxistinên Kurd ji hemû parçên Kurdistanê, şexsiyetên ku li dervayî welat in û nûnerên komeleyên kulturî, sazîyên navnetewî yênsani, di konferansê da cih girtin. Dî dawîya konferansê da biryarên pêş hatine girtin. Em li jêrê wan diweşînin.

Redaksiyon

Dîvê êdî gelên dinyayê rê nedin bindestiya gelê Kurd, ku ji 20 milyoni zêdetir e. Ev rewş ji alîkî va aşîti û serûberiya Rojhilata Navîn tehdît dîke, li alî dîn ji qaideyên mafên insani yênsani tehdît dîke.

Li Kurdistanê mafên insani bî awayekî sistematîk û berfireh di bin lîngan da ye. Girtinên kêfî, êşkence, bî dadgehên êretî yan ji bê dadkîrîna pîvandîna cezayên giran; "dî bin çav da windabûna girtîyan", qirkîrîna, şer û êrîşên bî çekên kimyayî, sîrgûnên komîtî; kambaxkîrîna xaniyan û talan, qedexekîrîna mafên perwerdegarî ya zîman, edebiyat, muzîk û tarîxa xwe (yê Kurdan), li kampên penaberan (penaberên Kurd) şertên neinsani û hovîtî bî salan e ku dom dîke.

Mafê çarenûsî deyne alîkî, ji gelê Kurd ra demokrasî ji laîq nehat ditin. Ew Iraqa ku li ser kaxîz mafê xudmuxtari daye kurdan, li navçaya xudmuxtari peyman û sozên xwe bî zordestiyên giran û bî rêvebiriyên girêdayî (kûkla) ji holê hilani.

Iran, Iraq, Sûriye, Tîrkiye û SSCB li navçeyên ku Kurd lê zêde bûn, di dem û wextên cûrbecûr da cehd kirin ku nufûsa Kurdan ji hev belav bikin, armancên helandîna huviyeta Kurdîti ajotin.

Heta ku ev neheqiyên han dom bikin, li Rojhilata Navîn aşîtiyekî rasteqîn Çênabe.

Jî ber vê yekê konferansa me:

- Ji hukûmetên Iran, Iraq, Sûriye, Tîrkiye û SSCB dixwaze ku ew ji Beyana Cihani ya Mafên Mirovî û peymanên insani ra hurmet bikin û prensîbên van peymanan li Kurdistanê û li şûnewarên Kurd bî cih binin.

Bang li van hukûmetan tê kirin û ji wan tê xwestin ku ew:

- Sîrgûnkîrîna Kurdan, kambaxkîrîna xaniyên

wan û talankîrîna malên wan bîdînin sekînan.

- Kurdên ku ji ber fîkîr û ditînên xwe hatine girtin bêne serbestkîrîna, êşkence û dardakîrîna ji holê bêne hilanin.

-Îmkan û mecal bîdînin Kurdên penaber ên siyasî da ku karîbîna ji sîrgûnê vegebin û hemû mafên hemwelatîyê bî dest xîna.

- Hêzên nehîni yênsani ku di nav polês, esker û qewetên parêzkar da ne û li hember gelê Kurd çerxa zîlma giran digerin, bêne belav kirin.

- Sistema huqûq û dadkîrîna li gor peyman û prensîbên mafên mirovî û prensîbên navnetewî bêne çespan.

- Tezminat bîdînin wan kesan ku bûne qurbanên hedîmandîna (ihlalkîrîna) mafên mirovî.

- Astengiyên ku pêwendiyên Kurdan ji hev qut dîke, ango bî sinoran ji hev qut dîke, ji holê bêne hilanin, berevajiyê van astengiyên alîkariya xurtkîrîna van pêwendîyan bikin.

- Dî eynî wextê da ji van hukûmetan tê xwestin ku ew mafê çarenûsî bîdînin Kurdan. Ew munaqeseyên ku aşîti û dostaniya navbera gelê Kurd û gelê cîran xurt dîke, tesîra xwe heye û bî kêrî munaqeseyan tê, bêne xurtkîrîna û alîkariya bêne kirin.

Konferansa me ji hemû hukûmetan dixwaze ku ew:

- Li Komîsyona Mafên Mirovî ya Yekîtiya Milletan, behsa neheqî û nemirovîyên ser Kurdên van welatan bikin.

- Li gor prensîbên navnetewî, yênsani ku bîkaranîna çekên kimyayî qedexe dîkin, hereket bikin.

- Hîm yek bî yek heqê Kurdên ku di warê insani da neheqî ditîne bîdînin, hîm ji gelê Kurd bîkarîbe mafê xwe yê çarenûsî bî destê xwe xe. Bî gîştî van heqên han piştî şerê xelîcê di çarçeveyê aşîti da bîdînin ber çavan.



Ji beşdarên Konferansê hîn şexsiyetên Kurd: Şêx İzeddin Huseyni, Ekrem Mayi -berpirsiyarê kampên penaberan, Prof. Şekroyê Xudo, Prof. Nadir Nadirov, Sekreterê PDPKS Hemid Derwêş û Sekreterê PDK-Suriye Kemal Ahmed.

Konferansa me:

- Ji Sekreterê Gîştî yê Yekitiya Milletan dîxwaze ku, eger Konferansa Navnetewî ya Aştiya ya Rojhilata Navîn bête cıvandın, pîrsa Kurdan jî dî vê konferansê da cih bigre.

- Ji Sekreterê Gîştî yê YM dîxwaze ku ew piştî lêkolînê, dî çarçeva YM da pêşniyar bike da ku pîrsa gelê Kurd û cıvatên ku dewleta wan tune bikeve rojevê.

- Bangî welatên ku penaberên Kurd werdigirin

dike, da ku ew zordestî û neheqiyên ku li Kurdan bûne bîdın ber çav, jî bo penaberên Kurdan tewreki insani nişan bîdın û ew wek penaberên dî jî hemû mafan istifade bikin.

- Ji Komîsariya Bîlind ya Yekitiya Milletan (UNHCR) dîxwaze ku ew jî bo penaberên Kurd ên Rojhilata Navîn, bî taybetî jî yên Tırkiye, Irak û İranê alikari bikin û jî bo vê yekê jî bangî hemû hukumetan bikin da ku ew piştgiriya UNHCR bikin.

BEYANAMA YEKEMÎN A YEKÎTÎYA NÎVÎSKAR Û HUNERMENDÊN KURDISTANÊ LI ELMANYA

Dî 1-3 Sîbata 1991'an da li bajarokê Weidenbergê kongra yekemîn a Yekitiya Nivîskar û Hunermendên Kurdistanê li Elmanya pêk hat.

Komîta avakirina Yekitiya Nivîskar û Hunermendên Kurd li Elmanya ku dî 30.11.1990 - 02.12.1990 da li Wedemarkê (Hannover) hatibû hîlbijartin, haziriya vê kongrê kir.

Endamêki komîtê, xêrhatina beşdarên kîr û bî kurtî behsa naveroka beyanama konferansa sala çûyî kir, ku li dervayî Kurdistanê kes nîkare nîvîsin û xwendina Kurdi qedexê bike; kolonyalistên welatê me, me jî mafên sîruştî (tabî) bêpar dihêlin, lê tevî bêparkirin û qedexekirinê ronakbîr û têkoşerên çanda Kurdi jî bona parastin û geşkirina peyv û hunera Kurdi dîkevî zindanan, canên xwe bona serfiraziyê dîdî... Û çiqas pîr in şehîdên peyv û hunera netewî...

Li Ewrûpa kes li pey me nagere, em serbest in, lewma çanda Kurdi çê û neçê pêşva dere.. Da ku çanda Kurdi geştir bibe û asoyên pêşdaçûna wê firehtir bîbin pêwîst e ku nivîskar û hunermendên Kurd bî tevahî bî hevra bixebitin, rêxistineke pişeyî, demokrasi saz bikin, jî lewra kongra me pêk tê.

Rêvebirên kongrê li ser pênc mijaran rawestiyân, ku ew jî aliyê pişkdaran va hatin pejirandin: "Kurtenasî û çalakiyên berhemvani", "Kar û barê komîtê dî nav-

bera du mehan da", "munaqêşekirina destûrê", "hîlbijartina komîteyeke nû". Dî navbera du rojan da pişkdarên kongrê bî delgermî tevî kar û barê kongrê bûn û bî firehî li ser pîrsên cuda rawestiyân; ew li wê rayê ne ku ev yekîtiyê pêwîst e ku bî rasti bibe dengê nivîskar û hunermendên Kurd li Elmanya û nekeve bin bandora partiyên sîyasi û bî dilsozî hewl bide da ku xwe bigihîne hemû ronakbîran. Dî kongrê da rind aşkere dibû, ku pêwîst e bî rêxîraw û dezgeyên kurdên hevarmanc ra bête axaftin çî li Elmanya, çî li dervayî wê û çî li Kurdistanê. Bo ku Elman li ser edebiyat û hunera Kurdi agahdar bîbin, beşdarên kongrê pêwîst dîtin ku berhemên Kurdi yên hêja bêne wergerandin û weşandin. Pişkdarên kongrê nerazibûna xwe li hember endamên komîtê yên ne amadêbûyî û sedemê nehatina wan ne aşkere, nişan dan. Bî dirêjî endamên kongrê li ser xalên destûrê rawestiyân, ew bî pêşniyar û bî dîtinên dî cih da hate tekûz kirin.

Dî dawiyê da komîteke nû hate hîlbijartin û kongra Yekitiya Nivîskar û Hunermendên Kurdistanê li Elmanya bî sîrûda "Ey Reqîp" kuta bû.

Köln, 05.02.1991
Komîta Rêvebir

PIRS : *Kek Eskerê Boyik, xwendevanên me pîr- hindîk te nas dîkin. Lê disa jî, jî kerema xwe ra dîkari bî kurtî behsa xwe jî xwendevanên me yê dervayî welat ra bîkî?*

E.BOYIK : Ez li Ermenistanê li gundê Gundesazê jî diya xwe bûme. Ehlê vi gundî dî sala 1929'an da jî hêla Entabê, jî aliyê Qerekosê bar kirine hatine vîra. Wan çaxan ev gund xirabe bûye, ava kirine û ketinê. Gundeki gelekî qedîmî ye, edetên bav û kalkan heta niha jî bî temami xweyî kirine. Hîn henî ku xên jî zîmanê Kurdî, zîmanên din nîzann.

Wextê şerê hemdînyayê yê duduyan bavê min diçe eskeriyê. Ez wan çaxan dibîm. Lema navê min danine Esker. Min jî da pêşîya xwe ku ez jî bîbîme esker, seba azadiya Kurdistanê... Min jî qelesa xwe hîlda ku jî bo welatê xwe hîn tîştan bîkîm.


PIRS : *Te çawa, çi çaxî dest bî nîvisinê kir?*

E. BOYIK : Dî gundê me da edetên Kurdan dijiya. Gelek çirokbêj hebûn. Dî oda gund da kal û pîr rûdîştin, qala dewra berê dîkîrîn. Çirok, serpêhati, laqirdî û henek dîkîrîn. Piçûktîya min dî nav wana, dî oda gund da derbas bû. Wek Mem û Zîn, Sêva Haco, Leyla û Mecnûn, beytên Feqiyê Teyran hemû ev tîştana dîgotin, distiran. Bî navê Eli kalek hebû. Dema wi xeber dîda, gîşt millet bêdeng guhdariya wi dîkîrîn. Jî kal û pîrên din ferqîya wi hebû. Niha difîkîrîm, eger ew xwenda bûya, esse wê bîbûya nîviskareki mezin. Dîvê

Bî helbestvan

Eskerê Boyik ra

hevpeyvîn



nîviskar jî usa bîn. Dîvê xwendevan guh bîdine gotinên wana. Wextê dî oda gund da kalên me behsa hîn tîştan dîkîrîn, ez wan çaxan vedîgeriyam malê, min ew dînîvisin. Hîn ew tîştên ku min nîvisî, li ba min hene. Dî gundê me da, li wê mîntiqê, li para Kurdan cara pêşîn mekteba Rûsî vebûbû. Zarokên dorberê gundê me dihatin û li wîra dîxwendin. Lê ew heta 12 sal ajotiye, paşê girtine. Ta hatina dewra Sovyetê disa dî sala 1930 da mekteb vebû. Ez jî çûme mektebê. Paşê çûme gundeki Elegezê ku wextekê paytexta nehiyê bû. Li wê derê

min mekteba dehan xilas kir. Li wê mektebê gelek meriyên pêşta xwendine û xilas kirine. Wextê em li kadroyên Kurdên Ermenistanê dînhêrîn, jî sedî 80'yê wan ew mekteb xilas kirine. Usa mektebeke bî nav û deng bû. Pey mektebê ez çûme Yêrivanê, ez ketime Înstîtuta Malhebûna Gundîtiyê. Min dîxwast edebiyatê bîxwinim, lê min kirine wê mektebê. Min wîra jî xilas kir, ba me dibêjin diploma sor, min jî ew diploma girt. Paşê bûme aspirantê aboriyê û li wîra jî bî dereca yekemin xilas kir. Niha jî li Înstîtuta Zanîngeha Aboriyê serkarê parê me. Xebatkarên li ba min, tamam îldar, merivên zana ne. Bî pîrsa îlm mijûl dibîn.

PIRS : *Kek Esker te got ku, dema ku min dî mektebê da dîxwend dest bî nîvisinê kir. Gelo kîjan pirtûkên te çap bûn an dî kîjan kovar û rojnameyî da derket?*

E. BOYIK : Min wê çaxê hîm bî Kurdî hîm jî bî zîmanê Ermenîki dînîvisî. Ew ên bî zîmanê Ermenîki, dî rojnameyên Ermenîyan da derdîketin. Rojnameya Riya Teze, dî dema şerê hemdînyayê yê duduyan da hatîbû dadan. Cara duduyan dî sala 1958'an da disa vebû. Yani pîştî mirîna Stalin dest bî weşanê kir. Min jî dest bî nîvisinê kir. Min hîm şîer, hîm jî nîvisên vekîrî nîvisî.

Berevoka min a pêşîn dî sala 1966'an da li Yêrivanê bî navê "ŞIVERÊ" neşîr bû. Paşê dî sala 1975'an da "KULILKÊN ÇIYA", ku dî sala 1979'an da li Istenbolê tevi Tîrkiya wê, dî nav Weşanên Riya Azadî da cara yekemin çap bû, niha jî li vîra, li Ewrûpayê, cara duduyan çap

bû. Em bî navê "BIHARA TEZE" salê yek berevok lî Yê-riyanê derdixîn. Dî nav van berevokan da jî afirandînen mîn derdikevîn.

Bî rasti kela mîn lî ser nivisînê vekîri ye. Tiyatro dînivisim. Cara pêşîn komediya "SINCO QÎZA XWE DIDE MÊR" nivîsi, hêj jî ev şano tê listinê. Paşê mîn şanoya "HEYF" nivîsi. Ev jî lî ser kulfeta (jîn) Kurda ye, ku pey sala 1918-20'an çî tê serê wan mîn nivîsiye. Şanoyeke dî jî mîn nivîsi. Lî ser tiyatroya "MEM û ZIN" ez gelekî xebitim. Ev jî lî cem we, dî nav weşanên Roja Nû da çap bû.

Ez gelek tîştan jî, jî bo rojnameya Riya Teze dînivisim. Lî Ermenistanê qasî 25-30 gundên Kurdan henîn. Ez tarîxa wana, nasandîna wan gundan her car hebek bo vê rojnameyê dînivisim û neşîr dibe. Dîxwazim pêşt ra vana gîşka berev kîm, bî sîfetan (sûret) va wek pirtûkekê çap bîkîm, bîla jî bo tarîxê bîmine.

PIRS : Kek Esker jî kerema xwe ra derheqa edebiyat, çand û hunermendiya Kurdên Sovyetê dîkari jî xwendevanên me ra hun agahdariyan bîdî?

E. BOYİK : Wexta dewleta Sovyetê çêbû, dî nav Kurdên Sovyetê da degme (pîr kêr) meriyê xwende hebûn. Ewana jî mektebên Rûsî xwendibûn. Pêşiyê mekteb vekîrîn, lê mamosteyên Ermeni ders dîdan, bî tipê Ermeniki alfabe çêkîrîbûn. Paşê Wezirê Perwerdeyî yê Ermenistanê gazi Ereş Şemo, Lazo û çend heba kîr û ewana jî bo Kurdan alfabe çêkîrîn. Mekteb vebûn, qurs vekîrîn. Bî vi awayî kultur pêşda çû. Bî rasti Ermeniyên seba Kurdan gelek tîştên baş çêkîrîn. Wê çaxê nivîskarên

wek Ereş Şemo, Ahmedê Mîrazi (xelkê Bazîdê û lî Bazîdê mekteb xîlas kîrîbû) pêşda hatîn. Paşê kadroyên me yê dî gîhiştîn, wek Heciyê Cîndî, Eminê Evdal, Casîmê Celîl, Wazîrî Nadîrî. Lê xeberên wan ên jî aliyê bedewtiyê kem bûn, çawa em niha dibêjîm, wek tîştên tarîxî bûn. Evana em dî nav edebiyata Kurdê Sovyetê da dî etaba pêşîn da hesab dîkîm. Van salan heta 30-40 kîtêb dîhatîn weşandî. Etaba duduyan dî sala 1950 da dest pê kîr. Vê carê şîer pêşda hat (pêş ket). Ev jî bî Şîkoyê Hesên dest pê kîr, Ferîkê Ūsîv, Mikayîlê Reşî, Sîmoyê Şemo, Cerdoyê Esed, Karlanê Çaçan, Rîzaliyê Reşîd û yê mayîn. Dî dawîya vê etabê da, dest pê kîrîn vekîri nivîsin. Ereş Şemo jî surgûnê vegeriya.

PIRS : Ereş Şemo jî hatîbû surgûn kîrîn, jî ber çî, jî kerema xwe ra dîkari behsa vê bûyerê bîkî?

E. BOYİK : Ereş Şemo wek gelek Kurdan dî sala 1937'an da surgûnê Sibîryayê kîrîn. Heta sala 1958'an lî wîra ma, dî vê salê da vegeriya lê nehiştî ku were Ermenistanê. Ew jî lî Gurcistanê ma, paşê îzîn danê ku vegere Ermenistanê; xanî danê, wek berê disa her tîşt danê. Niha mala wî lî orta Yêriyanê da ye û lî ser kevîrê mermer nivîsîne, ku jî vi çaxî heta vi çaxî Ereş Şemo lî vê malê maye.

PIRS : Wextê Ereş Şemo vegeriya yan jî gelek dû da, dî derheqa surgûnê da tîşt dîgot, an jî nivîsi?

E. BOYİK : Heta mîrîmê jî dî derheqa vî tîştî da qet tîştêk nenivîsi û tu tîşt jî negot. Rast e ewana efû kîrîbûn, hatîbûn, lê ev du salên dawiyê gelek tîşt lî ser surgûnan tînen

nivîsin.

PIRS : Gelek Kurd hatîbûn surgûn kîrîn?

E. BOYİK : Belê gelek Kurd hatîbûn surgûn kîrîn. Kurdê belengaz xwende jî hebûn. Navêk usa datanîn ser wana ku jî hişê wana jî derbas nedîbû. Rojekê tîne gundekî Kurdan, çend gundiyan dîgîrîn dibêjîm hûn Troçkîstîm û wana surgûn dîkîm. Belengaz ne navê Troçkî, navê Lenin jî, bawer ke nîzambûn. Gundiya ne dîzambûn ev çî ye, ew çî ye, lî pey pezê xwe bûn.

Belê em vegeriya ser mesela çand û edebî. Ereş Şemo wê çaxê "Jiyana Bextewar", "Dîmdîm", "Kurdê Elegezê" nivîsi. Heciyê Cîndî "Hewarî", Ahmed Mîrazi "Bîranînen" xwe nivîsin, evana jî aliyê nivîsîna dûz (nesîr) va pîr baş bûn. Lê helbestên me jî pêşda çûn.

Etapa sîsiya, dî destpêka kutasiya sala 60'an da bû. Wê çaxê em cahîl bûn. Tosîn bû, Eliyê Teberî bû û yê dî. Me helbest jî qalîba qedîmîyê derxîst. Paşê Çerkezê Reş, Elixanê Memê pêştî hatîn.

Niha teqleki teze hatiye. Prestroykaya Gorbaçov. Wadê niha ku her tîşt merî dîkare bînivîse. Berê me pîr tîşt nîzambû, wekî jî me ra çî dîgotîm me jî dînivîsi, ne tenê em, hemû nivîskarên Sovyetan usa bûn.

PIRS : Pîrsa çapkîrînê lî cem we çawa ne kek Esker?

E. BOYİK : Rojnameya "Riya Teze" her derdîkeve, kîtêbên Kurdî çap dîbîn. Lê niha rewşa me gelek zehmet e. Niha salê 2-3 kîtêb em ancax dîkarîm çap bîkîm.

Ew jî jî 500 hejmarî zêdetîr nînin. Bî rasti jî gelek dîrêj dîkîşîne. Niha kî bîxwaze bî xwe dîkare çap bîke. Lê pere

lazım e, kaxız lazım e. Em dıxwazın kovareki derxın, pirtûkan çap bıkın. Lê çawa hûn ji dızanın dı nav miletê me da xwenda kê m in, nıkarın bıxwinın. Çetınahi lı pêşiya me gelek in.

PIRS : Pirtûk, kovar an rojnameyên ku lı welat an ji lı der welat derdıkevın, gelo dıgıhijine dest we an na? Heke dıgıhijın, tesir lı ser we dıkın an na?

E. BOYİK : Em lı Ermenistanê dıjin, helbet berê pêşın nıviskarên miletên cınar û yê n mayın tesirê lı me kırı n. Lê ez çawa nıviskar, dersdarê xwe dıhesı bınım oda gundê me. Pêşiyê me ewqas edebiyata miletê xwe nas nedı kırı. Çı nku dı destê me da kê m bû n, tune bû n. A. Xani bı Rûsı derket, şı ê rên Cızırı yê n bı çû k dı ketın destê me, zımanê me ji ewqas tê da nedı çû. Feqiyê Teyran ji me ji devê millet dı bı hıst. Me Cıgerxwın vê axırıyê xwend, wek çemekı gur kete nav me. Kovar û rojnameyên dı n hın caran dı ke vın destê me, lê pı rani her yek lı cem xwe dı hê le, belav nabe.

PIRS : Dı şaxên edebiyata mayın da rewşa Kurdan çawa ye?

E. BOYİK : Wextê em edebiyata Rojhilatê hı ldı dın, bı rasti ji helbest bı temama pêşta ye. Em ji parek ji Rojhilatê ne, lema dı nav me da ji helbest pêşta ne. Dı van axırıyan da tıştê n vekırı wek roman, çı rok, şano û yê n mayın ji pêşta dı çın.

Dı warê resım, heykel, sine ma û şano yan da bı rasti em gelek ji para ne. Lı Tıblisê û gundê me du heb sûretkêş henın. Hın kes henın ku Akademiya Bedewiyê xı las kırı ne, lê kê m in. Lı Yê rıvanê

bı navê hesen artisteki me yê profesyonel heye, lı tiyatroyê kar dı ke. Dı tiyatroya pandomimê da serkar Kurd e, her usa ji pandomimvaneki bı nav û deng e (Arsen Polatov). Dı tiyatroya Tıblisê da ji Kurdê baş henın. Artista sirkê Naza Şıroyı, gelek artisteka eyan e, lı ser jıyana wê film hatiye çê kırı n. Gelek ji henın ku em nas nakın, an ji navê kurdayeti yê lı xwe danayın.

PIRS : Kek Esker, jı aliyê wergerê va Kurdên me yê n Sovyetê çawa nın?

E. BOYİK : Şaxek edebiyatê ji tercıme (werger) dı kırı n. Gereki usa tercıme bı kırı ku bı be hebû na gelê xwe. Em lı Ermenistanê gelek tercıme dı kırı n, çı Kurdı bı zımanê dı n, çı ji ji miletê n Sovyetê bı zımanê Kurdı. Lê belê mecalê n me pı r kê m in. Lê dı vê ez bê jım, ku ev karê han ji bo edebiyata me pê wıst e. Em ji alı tercımê ji ji para mane, dı be ku ev gunehê me ji nı ne, dewleta me tune. Bê tercıme em nıkarın edebiyata xwe baş bı dı ne nasın, em tenê bı ke vın qalı bê xwe pêşta dı çın, gerek ji qalı bê xwe derke vın.

Ez nıha dı fı kırı m, ku ji me ra yekıtiya nıviskarê n Kurdên temamiya dı nyayê lazım e. Çı nku nıviskarê me lı temamiya dı nyayê belav bû ne. Ev yekıti karê tercıme ji, derxıstına pırtûkan û meselê n dı n ji dı karı bû hel bı kırı ra. Paşê wê bı zımanı bın, yekı tıştê k baş nıvısiye, weki iro derxıstına wı bı kê rı millet tê. Nıha her kes dı tanga xwe da dı nıvıse û kes haj ji kesi tune. Dı be ku nıviskareki baş be, lê bı salan tıştê ki wı çap nebe. Nıha em dı ke vın qırna 21'an, dı vê em lez bı kırı n. Gerek yekıti hebe, dı her welateki da ji wek sekısyon şaxê n wı hebın. Ev ye-

kiti dı kare millet bı gı hı ne hevdu, partıyan bı gı hı ne hevdu, ew dı kare dutıretıyê n (du bendıyê n) nav millet safı bı ke.

PIRS : Kek Esker tenê yekıtiya nıviskarın an ji tev hı nermendan yekıtiyek saz bı be çê tır e?

E. BOYİK : Ez nıviskar ım, lema pêşiyê evı dı bê jım: Helbet hemû dı nav yekıtiyê da cı h bı grın baştır dı be. Her usa ev yekıti pırsa tı pên Kurdı ji dı kare hel bı ke (tıpê Latıni, Kırılı, Erebi). Bo misal, kıtê bê n ku bı tı pê Erebi der tê n, helbet ê n Kurdı, ez nıkarım bı xwınım, usa be hın baştır e ku ew Rûsı be. Wê çaxê ez dı karım bı xwınım û fehm bı kırı m. Kıtê bê n me dı çe İ rânê, İ rraqê, ji wan ra çê tır e ku ew kıtê b qet tune bû ya, lê bı Farısi yan Erebi yan ji Fransı bû ya.. Lazım e ku em tı pê latıni bı bı jê rın. Her usa lı Ewrûpayê ji latıni ye, ew ê me hın nê zı kırı tırê hevdu bı ke.

Jı aliyê dı n va dı vê em cû dabû na zaravan ji hê di hê di safı bı kırı n. Bê şık bı ngeh yek e, Kurdı ye. Ev xebatê n han wê zıman, kultur û edebiyata me ji pêşta bı be. Her usa pırsa mıletıyê (neteweyi) ji hın wê pêşta here û yekıti wê çê be.

PIRS : Kek Esker, xebata we ya beri Gorbaçov, bı gotınek dı n beri perestroyka û pey perestroyka çawa bû?

E. BOYİK : Berê gelek tıştê n baş hatın çê kırı n. Pı rani lı Ermenistanê pêşta çû. Jı ber ku mecal dı dı ne Kurmancan. Dı Azerbeycanê da demekı Kurdıstana Sor hebû, paşê wextê Stalin hat hı ldan, Kurd surgû nê Asyaya Navın kırı n. Komeleyê n demokratik ê n Kurdan tune ye, ne ku yê kurdan temamiya

miletên dîn nine. Dî temamiya Sovyetan da tenê yek heye. Dî hemû komaran da şaxê wê henîn. Lî şaxê Ermenistanê ji em henîn. Ez ji demeki sekretêrê wê seksiyonê bûm. Em ne gelek in, qasi 25-30 kes in. Zemaneki komeleke me a cahilan (cıwanan) hebû, 10-12 salan gelek tîştên baş çêkîrîn, paşê hêdi hêdi temûri.

Niha komeleyek me bî navê "ROJ" heye, ev ya xwendekaran e, şaxê wê lî gundan heye. Komek ji ya Kurdên Êzdi heye. Bî zîmanê Ermenî û Kurdî rojnameyêke bî navê "Dengê Êzdiyan" derdixî. Lî Tîblîsê, lî Alma Atayê ji komele heye. Lê ya herî mezî lî Moskoyê, Komela Yekitiya Kurdên Sovyetê ye. Evana hê serbixwe ne, texmîna min, wê dî nav xwe da bîbîn yek. Dimîne ya Êzdiyan.

PIRS : Armancên wan komeylan bî gîştî çî ne?

E. BOYIK : Pîrsa pêşîn a Kulturi ye. Millet top bîkî (lî hev bîcîvînin), xweyî bîkî, dutiretiyê ji ortê (holê) rakî. Hînkîrîna zarokan, pîrsa hebûna milletê Kurd, heqê demokratîk û yê erdê hel bîkî. Niha gelek kooperatîf henîn ku ji bo rojname Riya-Teze derkeve, alîkariya malî dîkî. Her kes dîkare bibe endamê wan komeleyan.

Niha mecal heye ku em bîkarîbîn derkevî derva. Çûyî û hatî wê xurt bibe. Yekitiya nîvîskaran wê ji vî alî va baş bibe.

PIRS : Kek Esker, bernamaya te ya pêşedemê çî ye?

E. BOYIK : Îsal lî Yêrîvanê serpêhatiya çîrokan ên min dertên. Jî bo zarokan, min gelek çîrok û helbest nîvîsiye. Ev çar sal e ku min teslim kîrîne, lê çap nebûne, iro,

sîbê her dîmîne. Dîvê îsal evana jî çap bîbîn. Berevo-keke min a şîera ya teze hazîr e. Tîştêki teze ye, navê wê min daniye "Ya serê sîbê". Şîerên hîmlî wek duayan hatiye nîvîsin. Lê mecala min a çapkîrînê tuneye. Texmîna min, eger evana çap bîbîn wê dî nav edebiyata me da gelek baş bibe. Ruhê dirûzgê ne, qewîmandîm e, zargotî e, ev tîşt in.

Ez niha lî ser du romana dîxebîtim. Evana jî jîyan û tarîxa me dertên. Çawa bav û kalê me revîne hatîne, ew dutiretiyên dî nav Kurdan henîn, çîra ev ketîye nav me, ev karê dîde kê? Çawa ku iro jî dutireti dî nav me da heye. Ez usa dîkîm ku xwendevanên Kurd bîxwînin û bîzanîbîn ku ev tîşt karê dîde dîjîmîn. Kurd hev qîr dîkî, jî hev tîşt-tîştî dîbîn, qeweta wana dîkeve, dîjîmîn hîm lî wî dîxe, hîm lî yê dîn dîxe.

Şuxul, emel gelek in, emrê meriya hezar sal be têrê nake. Em Kurd gelek tîştan bîkî, gerek e ranezên, gerek e rêkevî, gerek e em lez bîkî, belkî em her tîştî bîkî da ku ev rîya han bîqede. Milletên dî gelek pêştî çûne, pêşîya me ketîne û niha jî rîya me bîrîne. Gerek em jî xwe ra rê bîbînin, gerek em ranezên, gerek em lez bîkî!

PIRS : Kek Esker, xên jî vana jî bo xwendevanên Roja Nû tu tîşt dîbêjî?

E. BOYIK : Gelek spas bo vê heypeyvînê. Dî karê edebî, çandî û hunerî da serketînê jî bo kovara Roja Nû dîxwazîm. Her usa jî serfirazî û serketîna xwendevanên delal dîxwazîm.

KULA ME

Dewr tîn, dîçîn em timê wa
Pey koça ra bê text, bê cî,
Dor me şûrê qetîxûnê
Arîşvêrsa gurê birçî...

Em jî ketîne xaxê giran
Teze bava dibijêrîn,
Ez Êzdi me tu mîsîman
Hevra kî in, hevra çêr in.

Dewsa yek bî û tîfaq bî
Şaşîyê berê hê tam dîkî,
Heta qîza em nadîne hev
Û nanê hev heram dîkî.

Yek me sunî ye, yek şî ye
Ava me tev çawa bîkîşe?
Wa em dîkî gazînan
Wekî bextê me yî rêş e.

Qebîlê me xên jî xwe tu
Êî eşîra nahebîrîn
Heyf û xûnêd me yê ser hev
Bavo bavo ha dîkîrîn.

Jî deh meriya çar axa ne,
Dudo şêx in, dudo pîr in,
Ê dînê jî mele, seyîd,
Dewrêş, alîm û feqîr in.

Her yek şah e, her yek padşah
Sînûr sura hev par dîkî,
Xelkê wê dîçîn hîvê, marsê
Em jî dîna hê kar dîkî.

A, roja me ev e bavo,
De were û vir dîn nebe,
Kîngê emê ser xwe da bîn,
Kîngê hîşê me wê hebe.

Dewr tîn dîçîn, em timê wa
Pey koça ra bê text bê cî,
Dor me şûrê qetîxûnê,
Em jî mîna gurê birçî.

22.05.1990
Eskerê BOYIK

Şairê ku Destana "Zembilfiroş" û "Mewlûd" nivisiye:

MELAYÊ BATÊ

(1417-1491)

A. Gernas

"Tarixa neteweya Kurd bî gelek navên niviskar û siyasetvanên hêja dagirti ye. Şairên Kurd ên sed sala navin, hemû astengi û di jwariyên pêşiya xwe hildane û ji her aliyan va edebiyata Kurdi di nava gel da, bî zîmanê kurdi belav kirine. Di nava wana da em dikarin Eli HERÎRÎ (1009-1079), Melayê CIZÎRÎ (1570-1640), Feqiyê TEYRAN (1302-1375), Melayê BATÊ (1417-1491), Ahmedê XANI (1651-1707), NALÎ (1797-1855) û gelekên din bijmêrin."

Wek ku li jor folklorzanê mezin Heciyê Cîndi ji dibêje, Mela Ehmedê Batê di nav hozan û niviskarên bijare da cih digre. Ew, bî epika "Zembilfiroş" û "Mewlûd" a oli li Kurdîstanê nav û deng daye. Bî taybeti ji, epika "Zembilfiroş" wek "Mem û Zîna" Ahmedê Xani, "Siyabend û Xecê", Kerr û Kulîk" û wd. naskiri ye. Her wisa "Zembilfiroş" bî hunermendiya helbest û naveroka xwe ya trajedîk dikeve navberhemên naskiri yê klasîk ên Rojhilatê û heta dinyayê.

Li gor agahdariyên ku hatine nivîsin Mela Ehmedê Batê, ji Hekariyê ji gundê Batê ye. Di navbera salên 1417-1491 da jiyaye. Dîgel berhemên "Mewlûd" û "Zembilfiroş", behsa diwanek wi ji tê kirin. Lê mîxabî ku heta niha derheqa vê diwanê da tu salxiyek esehi tune.

Navê Melayê Batê yê rasti Husên e (li ser rûyê çapa Mewlûda ku 1906'an da li Stenbolê bî tipên Erebi hatiye çap kirin û di sala 1987'an da ji ji ali weşanxana Roja Nû va bî tipên latini hatiye çap kirin dîwîse, ku "Nezma alimê feqîr Husênê Ertûşî, ji feqiyê şafîi ye) û wisa tê zanin ku ew ji eşîra Ertûşîyan e.

Li gor agahdariya Qanatê Kurdo, folklorzan û Kurdnasa Sovyetê Jakelin Sûrênovna Mûsaelyan di sala 1978'an da li ser destana "Zembilfiroşa" Mela Ehmedê Batê lêgerineke gelek hêja dike. Deh-dozehek şeweyên Zembilfiroş rûbarî hev dike, li ser kêş, qafiye û lihevanîna rêz û ben-

dên wan hûr dibê. Iro ev lêgerin hatiye çap kirin.

Wek tê zanin "Mewlûd" gelek caran bî tipên Erebi hatiye çap kirin û di piraniya malên Kurdan da heye. Disa wek tê zanin ku weşanxana ROJA NÛ, di Sîbata 1987'an da cara yekemîn bî tipên latini "Mewlûd"ê ji nû va çap kir û pêşkêşî xwendevanên Kurd kir.


"Mewlûd" bî naveroka xwe behsa jîyan û serpêhatiya Hz. Mihemmed dike. Armanç û hunermendiya ku vê berhemê balkêş dike, qimeteke mezin didê:

1- Bî armanca nişandana dewlemendiya zîmanê Kurdi û parastina wi, nivîsina berhemê ye (eger meriv rewşa wê demê, tesîra dinê îslamê û zîmanê Erebi bide ber çav, ku iro ji ev tesîr gelek xurt e di nav gel da)

2- Hunerê ku di sinetê şîer da hatiye nişandan. Di vê serboriya helbesti da kêş, qafiye û lihevanîna hostatiya Mela Ehmedê Batê baş dide xuyan. Di Mewlûdê da gelek gotinên Erebi û Farisî ji hatine bî kar anin. Ez di wê baweriyê da me ku, wê demê di şîereki da bî karanîna çend zîmanan (ne tenê bî karanîna gotinan û bî rêzkirina wan) û rast-bicîhkirina wan, wek kareki hunermendi û zanistiyê di hate qebûl kirin, ango wisa xuyaye ku M.E.Batê bî zanistî vê şeweyê bî kar anîye.

Berhema duduyan a ku li seranserî Kurdîstanê belav bûye, bî rîya zargotîni ji nîşeki derbasî nîşeki dîm bûye û gihaye heta iro, destana "Zembilfiroş" e. Qasî ku em pê dîzanin, di nava gel da gelek şeweyên Zembilfiroş tên gotin. Hemû şeweyên "Zembilfiroş" bî naverokên xwe, xwedi eynî babetî ne, lê bî bend û rêzên cîhê hatine nexşkirin û nîrandin. Hebûna varyantên "Zembilfiroş" dewlemendiya gelê Kurd û zîmanê wi, edebiyat û folklorî wi dide xuyan.

Me dixwest ku di derheqa vê şairê me yê mezin da agahdariyeki fireh bîdin, lê mîxabî agahdariyên ku hene bersiva vê daxwaziya me



KOŞKA
ZEMBILFIROŞ:
Lı Farqinê (Silvan)
ye. Dı sala 1007'an
da,ango dı zemanê
Mervaniyan da hatiye
çêkırın.
Wek gelek heyiyên
me yên diroki, ew ji
bêxwedi ye, hıldışe,
tê hulşandin,
tê tunekırın...

nade û ji ber vê yekê em nıkarın zêde lê hûr bıbın. Eger destnıvisara Diwana wi (ku behsa diwaneki wi tê kırın) bı dest keve û bête çap kırın, hêviyeki mezın heyê ku dı derheqa jiyana wi da gelek tıştên nekıfşkıri derên holê (ku hema bêje hemû şair û nivıskarên klasik ên kurd dı diwanên xwe yên taybeti da rêçıka nasandına xwe bı kar anine û pêşkêşî gelê xwe kırın).

Em lı jêr çend nımûne ji şîrên wi dıdın:

Jİ DESTANA ZEMBILFIROŞ

Zembilfiroş zembila tine
 Kolan bı kolan dıgerine
 Xatûnê lı jor dibine
 Hış dıçe aqıl namine.

Zembilfiroş lawkê Ebas e
 Tenê derpê û kıras e
 Jı Xatûnê nake xılas e.

Zembilfiroş lawkê dewrêş e
 Kerem ke tu were pêşe
 Qimeta selka tu bêje
 Selka lı ber deri bı kês e

Zembilfiroş lawkê biyani
 Kerem ke tu were bani
 Qimeta selıka tu zani
 Xalk xam e tışte nızane

Xatûnê bı gerden mori
 Şuxul nabın bı kotek zori
 Tırşa mın jı rebê jori
 Lawıko dınya şirin e
 Tu lezke derê werine
 Kêf û daweta bıbine

Tu mın jı Xwedê netırsine
 Xatûnê wez tobedar ım
 Delalê wez tobedar ım
 Tobedarê rebê cebbar ım
 Jı xalıqê jori wez nıkarım

(Ev çend bendên Zembilfiroş, lı hêla Diyarbekır tê gotın û dı nav xelkê da gelek belavbûyi ye. Jı bıli viya Kela Zembilfiroş bı xwe lı bajarê Farqinê (Silva) ye û niha ji nivê kelê lı piya ye. Jı devê pir û kalên wê derê tê gotın, ku dı dawıya sedsala nozdehan an ji serê sedsala bistan da albayeki Tırkan dıxwaze Kela Zembilfiroş hulweşine. Bı fermana wi albayê, esker dıkişe serê kelê û dest bı xerakırına kelê dıkin. Ev bûyer xelkê gelek xemgin û acız dıke, jı ber ku xelk qimeteke mezın dıde Kela Zembilfiroş û destana Zembilfiroş dı dılên wan da şax daye. Hemû bıneçihên Farqinê lı hev kom dıbin û êrişî qonaxa hukumetê dıkin da ku hulweşandına Kela Zembilfiroş bıdın sekınandın. Xelk bı ser dıkeve, Kela Zembilfiroş jı hulweşandınê xılas dıbe. Lê mıxabın heta ku dıdın sekınandın, alıyeki kelê tê rûxandın.)

Wek me lı jor ji got, M.E.Batê zêdetır bı berhema "Mewlûd"ê tê nas kırın û jı destnıvisarên wi tenê "Mewlûd" hatiye çap kırın. Em lı jêrê çend bendên Mewlûdê dıdın:

Ew Xudayê bê nezir û zulcelal
 Bê misal û bê heval û bê zewal

Razıqê bê dest û pa û mar û mûr
 'Alımê sırra negoti der sudûr

.....
 Ez Rebiul' ewwela şev-rewşen e
 Heştê şev borin lı hemla Amine

.....
 Ew ki bûn? Hewwa û Sara, Asiye
 Ya lı pêşem Meryema Imrani ye

Meryemê husn û melahet zêde bû
 Palvedabû ew jı bo mın tekye bû

.....
 Hem jı bo her çar imamê cadeyê
 Hem jı bona katıbê vê nusxeyê

Bo cemi'ê muslimin û salıh e
 Bo feqirê Bateyê elfatihe!

(Mewlûd, Weşanên Roja Nû, rûp: 9, 34, 35, 63)

"MEMO"

Dengeki resenedi dî helbestvaniya Kurdi de

Husên HEBEŞ

Me dî demekê da hev nas kir, ku me bawer dikir emê nemumkênan biçeminin, piştî wan xwar bikin û wan wek hespan rakin cididê...

Proja sazkarîna komeleki jî xwendevanên kurdî ra li Helebê dî sala 1966 de em bî hev dan nasandin û jî wê demê de û ta roja iro birên azadiyê û huneriyê me nêzîki hev dîkin...

Memo (mîn ev bernava hîlbijart) dî sala 1946 de li gundeki Kurdistanê hate dinê. Jî zû de sêwi dimine, li ba xwişka mezin ew gewre dibe...

Herweha jî zû de jî Memo dest avêt qelem û firçê; çirok nivîsi, tablo (lewhe) vehand, lê berê nûkê (serê tûj ê her tîşteki) wî bêtir ber bî helbestan çûye; jî bist û pênc salan bêtir jî helbestnivîsinê, Memo, pênc berevokên destnivîs amade kirine (bî erebî û dudo jî bî Kurdi). Wek ku ez dizanim ta niha berhemek jî belav nekiriye. Dî namekê da mîn jî hoyî wî yê bêdengiyê pîrsî, ku çima xwendevan jî wan karên bedew mehrûm in? Wî tenê probleman bî nav kiribû û pîrsiyara mîn li mîn kir: "Ma tu çare li cem te hene?"

Bersiva mîn jî ew bû, mîn dest bî wergerandina vê berhemê kir (jî Erebi) ku ez çiqas bî vê ra westiya bîm jî, ewqas jî dî ber ra şa bûm, ku mîn kari (bêguman li gor raya mîn) ev helbesta resen (orijînal) wergerinim zimanê Kurdi...

"Kevirê biranînê tol bû", awazeke çiyayî û bî şewat e. Ew şewat ne tendêseke bedbîni ye, bî vajayî wê protesteke hêmin e, ku çiqas dem bî ser hev jî werbîn, bergeha çavdêriyê wê were birin û rûbarê memukên wê bî ava pîroz bişon...

KEVIRÊ BIRANÎNÊ TOL BÛ

Bî nermî peya be..
Te xwe bilind diti..
Ev çiriska çavê giyanê rewşen dîke,
Şanaziya govde rijindar dîşewitine..
Bî bahozê dîqefine..

Bêdeng xwe gulok bike..
Ma tu natirsi.. Êşa biranînê..?

Ev lepa mîn e..
Û dûrî dî navbera me de..
Hin rawestiya ye..

Ey şiverêyên sing..
Ma bergeh heye
Jî hespên serrakirî re
Ku stuyên xwe dirêj kirine?..
Û tivirkên bî me re hevrê..
Paşê rû badan û bî şahî dîçirikandin?..

Bî hêrs bipeqe..
Ev jiya mayî
Kelaşeki hîşk e!..

Tol be,
Tol be..
Dîl li pişa te ye..
Û ev sordamarên rijindar..

Tol be..
Lûme li pêlê nabê,
Û ev keştina.. Ewna tirsonek in!..

Tol be..
"Pirozi" tu.. pak bike
Çî tu kari jî dewsa wê..
Xwedi ser hev werke..
Rê bî hindava wê de dijwar e..
Û ew ewrîna.. ziya
Jî çavên wê tene xwar!..

.....
Tol be..
Kevirê biranînê..
Xwe gulok bike..
Cihani kavil bike..
Û xwe vê re kavil bike..
Nema tu gul
Dî gulistanê de bihn bîdîn
Û ne tu cih jî şahiyê re,
Jî serlêdayeki re -piştî bêhêviyekê-
Pêrgî serlêdayê xwe dibe..

Kavıl bıke..
Û xwe vê re kavıl bıke..
Tu ne yê bı serketi yi..
Û hemû ceng
-Û çiqas dirêj ji bıkın-
Ziyandar in!..

Tol be..
Ma te azar nedin dı ber evina wê re?..
Ma tu newestiyayi?..
Ma tu serxweş nebûyi?..
Û evin..
-Eger nema-
Dujeh rındtır e!..

Tol be..
Ev sordamarına..
..Demekê guldar bûn
Û we can..
Bihn teng bûn.. Dema em ji bir kırım
Û ser gerdan ketın xwar..

Navdari bêdeng bû..
Ma bılbılek
Dı gorıstanê de dıxwine?..

Tol be..
Dem ji me re..
Rêhan bû
Û em..
Carına dı meraqên lawini de
Bijînên "stemi" bûn
Û carine dın
Arezûynê gawiri bûn!..

Tol be..
Hemû rê wek hev in..
Û hemû bijînên navtengê
Û heyranên westiyayi..
Hin dı biraninê de ne..

Çı rûbarek memkên wê
Bı ava pirozi neşû..
Ew gawır e!..
Çı stêrek evina wê venejine..
Ew gawır e!..
Çı kulıkek rûyê wê nexemline..
Ew gawır e!..
Çı xwedêyek lêvên wê piroz neke..
Ew gawır e!..

Tol be..
Rêhana dıl
Çavên xwe damırandın
Û rawestiya can dıda..

Kevirê biraninê
nema çik dıde,
Ma hêviyek heyê
ku dıl xemgin bıke
yan şa bıke?..

Tol be..
Ew deşta aran dıke
-Ger te xwest-
An te berda..
Û deşt aloz e
Û bêdengi sereka êşa ye,
Pışti -çirikandıneke dırêj-
Mırım xwe têwer dıde..

Tol be..
Her stêrek xwedi çerx e
Û tu yyê yekta yi
..Bê çerx i
Kevirê biraninê.. dılê mın e,
Bêgane ye.. westiyaye..
Û
Çavdêriyek wi dıkuje.

26.07.1989

FERHENGOK

çırisk : ronahiya bêhêz
Çirikandın : xwendına çivikan
tıvirk : Balınde, fıırinde
hevrê : hevalê rê
ji : temen, emır
kelaş : laşê mırı, cendek
lûme : skala, gılı û gazi kırım
keşti : gemi
hındav : bı ast, bı iticah
pırgi bûn : resti hev hatın
ziyandar : zırar kırım, derdayi, durandın
azar : êş, derd û kul
dujeh : cehenem
wec : qafiye, bêjeyên paşın dı malıkên heybestan
de ku hevdengû hevawaz bın
bijin : bêzi, dılçûyin, iştıha
heyran : cûreyeki strana
arezû : daxwaz, bêri
rûbar : çem
aloz : dijwar
çavdêri : lı bendê mayın, çavrê kırım
bêgane : xerib, nenas

Feqir Ahmed

Gul bû ala mîn

Bihar kesk, sor û şin
Gulê dî vîr da dîda bin
Mîn gul hîlda mîlê xwe
Gul bû al û da mîn jin.

Gulo hate mala mîn
Evin û sersala mîn
Al dîda ser dilê xwe
Şewqa xwe da çavê mîn.

Navê gulê Ala mîn
Hez dikete mala mîn
Al dîda ser serê xwe
Al ronîya çavê mîn.

Al ji xemla mala mîn
Zani û hînîr dîda mîn
Maçek dîkir Ala xwe
Al evîna dilê mîn.

Mîn ala xwe hîlda jor
Dînê tev da dîkir şor
Mêrê Kurdan pêhliwan
Tev rabûn xwe dane dor.

Mîn dit sîlavek lê kir
Dilê mîn ji tev geş kir

Dî vê cejna Newroz da
Kurdan pîrozek lê kir.

Al tu bûyi jina mîn
Evin û tu xwana mîn
Tu bûyi Ala rengin
Tu çûyi ser bana mîn.

Ala kesk, sor û gewr
Ew ji mîn ra bû enber
Mîn Al dani her derê
Lî ba ket û bû cewher.

Al lî ba ket bî jor da
Sîlavek da te Kurdan
Şewqa alê da welêt
Şêni û şahî bî ser da.

Al lî Dêrsim dibû reng
Dijmîn hat me kîre ceng
Mêrê Kurdan qehreman
Lî vê derê dîdan deng.

Al lî deşta berazan
Lî ba ket û bî rêzan
Din, şedad, did û pij
Rakir tev qata xîzan.

Ala mın lı Elbistan
Cıwan dıçûn dibistan
Al ket cejna Bêşikçi
Her der dibû gulistan.

Ala mın lı Zagros e
Bı çar rengan dıbrûse
Jı Suruc heta bı Wane
Ew gişt çiyayê Bitlise.

Silêmanê û Kermansah
Al lı her der bû nişan
Hêzê Kurdan giştın hev
Cıvin çê bû lı Senandej.

Al lı Amed ba kırım
Mêrê Kurdan şer kırım
Riha, Mardin, Mûş, Sêwaz
Xarpût tevi xwe kırım.

Bingol, Sêrt û Hekari
Lı Agırê xwin dıbari
Al lı Meraş lı Ezirgan
Meletiyê ker û lal i.

Al lı Şengal dibû geş
Kêfê gel lı Dihok xweş
Destê gelê Kurd da tev
Dixwinın Mıshefa Reş.

Dayikê ban kır lawê mın
Al rakır dıda dest mın
Lawo tu lê xwedi bi
Ku tu bıki xemla mın.

Ezda ban kır kurê mın
Hele rab were cem mın
Xemla diya te xwina gel
Ew Ala te û Ala mın.

Me bo Alê xwin rêj kır
Bı sed salan dirêj kır
Tırk, Ereb û Ecem tev
Gelê me pêra şer kır.

Ew diroka mın hanin
Xortê Kurd lı ser danin
Welat ket bın Ala mın
Navê Kurdistan danin.

Ala sor û gul peri
Hez dıhate ber deri
Geli dest dıdane hev
Al dıdane ser seri.

Alê bin da jin dıda
Lı her derê pêl dıda
Xwin da şehidê Kurdistan
Rabûn silav lê dıdan.

Gula kesk û gula sor
Zer û sıpi tev lı dor
Ew bû Ala çar rengin
Toxa cewher hılda jor.

Ala mın lı ser dibistan
Şêni hatın ji Kurdistan
Tev bû şahî û şênayi
Şewqa xwe da Kurdistan.

Lı ser banan dibû geş
Welat gışki kire xweş
Va pêşmergê Kurdistan
Ber Ala mın kırım meş.

Ala gewr û gula şin
Lı ser derê dıda bin
Gelê Kurdistan Feqır
Dıda wana tev da jin.

25.10.1981



Lihevanin

(BEND-DİLOK)

zazaki

Ez vécena diari keri
xwî ya cîer oniena deştê Beri
Wa gawîr mevin dêrdi zeri.

Niver weko wiver weko
Dest xwî merzo na lêyeko
Heto çal mî fêkra mewêc
Şar xerib ra ino meko.

Tu berbêri tu berbêri
Tu xwî daw na mehleki ni wivêri
Heyf mî ni heyf ez tersena
Wîsar biero tu eskêri.

Êro hoto sibey heşto
Cîm mî hanuk riyêr deşto
Ez wasti xwî ser biya aşîk
Mî kulêng guret o gêreya geşto.

Çî kêneka lo deri verda
Şehra sûra lo sari serda
Mî xwîr guret lo nişon kerda
Heton siya xeribê ameya
kutik baykon şari lo xwîrîz berda.

Mî va êyo tu va êyo
Sarê xwî bûr na rîndêyo
Tu ser vîndi heton kêyo
Heton tu xeribê ra biêr
Tiela sipî perîna mî gilêyo.

Nadê ma zûalê pêso
Soz xwî medîr hemî kêso
Soz xwî bîdir sonê pêso.

Ez ni vera tu wî vera
Mî ni vera zel cenaya
Tu wî vera reqîseya
Tu mon eşîrê Bêrtêyîjond
Zelê mî lacêki zazay sîlasnaya.

Zerê mî no zerê bîzi
Bîzi wenû gil nêrgîzi
Zerê mî kota emon-yemon
Na kêneka çit kîrmîzi.

Zerê mî no zerê varî
Varî venû gil perparî
Zerê mî kota emon-yemon
Na kêneka sûret qemeri.

Zerê mî no zerê niyo
Mîzî vena gil na kiyo
Zerê mî kota emon-yemon
Na kêneka fîston kîyîyo.

Zerê mî no zerê gayo
Gazî wenû awkê vayo
Zerê mî kota emon-yemon
Na kênekê ni zazona.

Zerê mî no zerê zîrac
Zîrac qaqîbnena sêr zînarona
Zerê mî kota emon-yemon
Na kênekê kurmoncona.

Arêkardox (Berhevkar):
Azad Dîldar

kurmanci

Ez û metê tev qurban
Gul û gihayê xırban
Cax û mendika çıyan.

Gıdi lêlê gıdi lêlê
Te xızê m ji çemilê sêlê
Te nadıme axê êlê.

Gulum gula bihara
Pel avêtiye diwara
Pıncara nav girara
Dıdim der û cinara.

Keremê simêl poş e
Cıla çê dıke çargoşe
Dıbe bajêr difroşe.

Kuro kuro kurani
Kevır avêt kewkani
Çavê kewê derani
Jı mın ra nêçir ani.

Kuro kuro kurani
Simêl soro berani
Terş-talan ji Mısrê ani
Jı bavo ra mal dani.

Kuro lawo kulineko
Genimê soro qelineko
Por reşo çav beleko.

Lêlê gulê gulguli
Lı dora gund fetili
Eynık dani xemili
Axê gund ji bo miri.

Lêlê reşê reşkeverê
Zêr girêda ser kemerê
Mın ramûsa weke berê.

Lı ber deri nebez e
Gorê nıga etlez e
Qıza xelkê negez e
Hemû kul û merez e.

Lolo kuro lawıjo
Kıras derpê paqıjo
Nêçırvano kewkujo.

Lolo lawo lawino
Şal û şapık hêşino
Mına hungıv şırino.

Mêvan hatın ji derda
Bûk ranebû ji berda
Mêrê bûkê bûk berda.

Mala Zınar bılınd e
Çêkırıye fêza gund e
Pırık lı ber bûye kund e.

Nava gunda geryaye
Çarix gore qetyaye
Kesi nanek nedaye.

Ro derketiye zınara
Si xwe avête diwara
Şıvan çûye nava pez
Xezal revı ha bı lez.

Rınd im rında welata
Xwezla edlayi bıhata
Kurd bıçûna cıvata.

Paşawo lı joro
Kaxız hatiye bı moro
Çêlek reş golık soro.

Jı bo xatırê bavê te
Jı bo kelpa diya te.

Xezal rûnişt lı ber sêlê
Peyak hate hafa êlê
Dayık bı qurban bıbe
Xala reş lı simêlê.

Wê da tê xwe dihejine
Şara piştê gulavdin e
Rihê keçıka jê distine.

Simêlreşo bı rê da
Nava gul û gihê da
Paşla qıza xelkê da
Qızık got: "Here wêda"
Nişkêva pehin lêda.

Serê girê Mûşê ye
Hes bıçûkê dayê ye
Kılê çavê Zınê ye.

Şemo şahê İranê
Şemo birne diwanê
Şûrê Şemo bıriqi
Axa ji tırsa xerıqi.

Şirin şekır navê te
Ez qurbana serê te
Jı bo xatırê bavê te
Jı bo kelpa diya te.

Xezal rûnişt lı ber sêlê
Peyak hate hafa êlê
Dayık bı qurban bıbe
Xala reş lı simêlê.

Wê da tê xwe dihejine
Şara piştê gulavdin e
Rihê keçıka jê distine.


Wê da tê bı mêrani
Şer xweş dıke bı Kurdani
Bû mêvanê pırıka toraqge-
ni.

Wi xudawo te daye
Dara bılınd si daye
Baran bında pal daye
Dijmın kerba rih daye.

Zerê bejinbılınd e
Çıqas bêji ew rınd e
Kê xwest Zerê nedanê
Ewê stand şêxê gund e.

Berevkar: **Bavê Zınar**

BEREVOKA TERMAN



KÊZİK Û MORİ

Kêzik, buxuk
Cirdixezal
Kêzika tiri
Kêzika rêxê
Kêzika reş
Kêzika hecê
Kêzika serşokê
Kêzika zêrini
Kêzkatûn, sormesorik, xalxalok
Kêzika textan
Heftcark
Qımbıl
Kuli, çekçeko
Hespê nebi, kerikê nebi
Qûnteşi
Tirtûl
Çırçırk
Gûstêrk, pirûpınd
Pırık
Zırxıtık
Mınmınik, pırpırk, baperik
Mori, gêrgêrik, mûristang, Gêle
Peng
Pirhevok, pırık

Dûpışk
Dûpışkê avê
Zûri
Cobır, maşot
Dûmeqes, heftcark
Şemar
Mêş, vızık
Vızika kûtiyan
Kermêş, kelmêş, pêşi, mixmıxk
Moz
Mêşehınguv, mêş
Pızeng, mozeqirtık
Mozezebeş, mozê sor
Mozê dewaran

YÊN PARAZİT

Spi
Kêç
Rışk
Bangışk
Gen
Qıjnik, gırni
Bızûz, bêyi
Spiyê daran
Spiyê pirtûkan

NEWROZ

Lı welat û lı dervayi welat bı xurti hat pirozkırın

İsal cejna me Newroz bı rengeki gelêri hat pirozkırın, çı lı welat çı ji lı dervayi welat pıştıgırıyeke pır xurt girt. Bı hezaran insan cıvande cıvınên xwe.

Ev yek ji ber sedemên politik bû. Ji bo ku demeke kurt be ji Kurdistanê bakur, gelê Kurd azad bû. Hemû bajar û gund ketin bin kontrola hêzên Kurdistanî. Vê serketinê germiya xwe da parçeyên din ên Kurdistanê û lı hemû deran cejna Newrozê geştir kır.

Lı seranserî Kurdistanê bakur û hın bajarên Tirkîyê -ku Kurd têda dijîn- bı dehhezaran va hat pirozkırın.

Lı Diyarbekirê

Hukumata Tirk isal bı bırıyareke totik Newroz wek cejna Tırkan da naskırın. Ji ber vê ji bı destên fermî ji gelek cıvın hatın amadekırın. Cıvınên ku bı awayeki sexte û fermî hatıbûn amadekırın, ji aliyê gel va rûmet nedit. Lê yên ku ji ali gel va hatın pirozkırın gıhiştın sewiyeke pır bilind. Helbet bı "serbestkırinê" yek ji armancên hukumeta Tirk ew bû ku naverok û mitolojiya Newrozê vala bike.

Herçiqas "serbest kırıbûn" ji hukumat ji vi awayê pirozkırinê gelekî acız bû û gelek êriş bırıy ser cıvın û şahiyên

Newrozê. Gelek welatparêz hatın girtın.

Lı Nuseybinê 21'ê Adarê da gel cıviya ku bimeşe. Lê polês gulebaran kır, Ali TURAN hat kuştın. Gel ev yeka protesto kır, dikanên xwe girtın.

Lı İdirê (İğdır) ji dijın xwin rıjand, nehişt ku gundiyan Özdemirê Newroza xwe piroz bıkın. Bı navê Kemal

helbest xwendin û ala Kurdi vekırın. Lı Universita Anqerê sed kes natın girtın.

Şeva mezin lı İstenbolê, ji ali HEP (Partiya Keda Gel) hat çekırın. Ji panzdehezari zêdetır insan têda beşdar bû. Şevê bı disiplina xwe, bı naverok û heyecana xwe temaşekar gelekî dılışad kır.

Lı Dervayi welat ji, lı hemû cihên ku Kurd lê dijın, şevên Newrozê hatın amadekırın.

Dı şevan da şahî, ken kêf hebû, û pıştıgırıya Kurdistanê bûbû noxteki pır berbiçav.

Lı Elmanyayê ji dı bı pêşengiya Federasyonê

Foto: D. Komkar

Budali zarokeki 9 salî hate bırındarkırın. Lı Diyarbekirê ji lı sũkan bı qasî hezar kesî slogana "biji Newroz" gotın û meşıyan. Bistûheft kes hatın girtır. Lı Edenê polês êriş bı ser xelkê ku cıviya bûn û dıxwastın agırê Newrozê pêxinın. Gel bı dirûşmên "Biji Newroz" "Biji Kurdistan" berxwe dan, çar erebeyên polêsan hatın şewıtandın. Dı vê bûyerê da 80 kes hatın girtın.

Lı Universita Dicle (Diyarbekır), İstenbol û Anqerê ji cıvınên pirozkoronê çêbûn. Beşdaran govend kışandın,

Komelên Karkerên Kurdistan - KOMKAR, lı çar bajarên mezin şevên Newrozê hatın amadekırın. Dı şeva Kolnê da 12000 kes beşdarbûn, ku heta nuha lı Ewropayê şeva herî mezin bû. Lı İngilistanê ji komela KOMKAR dıgel hezar kesî va Newroz piroz kır. Lı Swêdê ji Federasyonê Komelên Kurdistanê şeveke mezin amade kır. Lı Hollanda, Sıwıss û hın cihên din ji şevên pirozkırinê pêk hatın. Dı hemû van şahıyan da pênçî hezar kes beşdar bûn.





Meymûn

LEO TOLSTOY

Keşti li hemû dinyayê geriyabû û niha vedigeriya welatê xwe. Hewa geleki xweş bû. Herkes li ser banê keştiyê bû. Temaşê dîkîrîn.

Meymûneke qerase, xwe jî wir diavête wir, rêwiyên keştiyê kêfxweş dîkîr. Çavên xwe rûyê xwe dîqurçimand û bî kîrînên xwe hemû rêwi dîda kenandin. Dît ku herkes bala xwe dîde wê, vêca herçiyê heye qeşmeriya xwe zêde kir.

Jî mîşkêva jî ciyê xwe pekiya û çû rahişte şewqê kurê qaptênê gemiyê. Meymûna mîzur şewqê lawîk rakir û dani serê xwe û bî stûnê va hilpask bû, derkete jorê.

Rêwi gişk tiq-tiq pê dîkeniyan.


Kurîk dî şûna xwe da şaş û matel mabû. Nîzanîbû çî bîke; bigri yan bîkene.

Meymûn li ser nikê pêşin ê stûnê rawestiya, şewqe jî serê xwe derxist û dest pê kir ew qelaşt. Meymûna dînik şewqê lawîk parçe-parçe dîkîr û jî alîki va jî tinazê xwe pê dîkîr, ser çavê xwe dîqurçimand û henekên xwe bî lawîk dîkîr.

Lawîk kulma xwe bîlind kiribû û berbî wê dihejand û li wê dîkîr qêrin. Wê çaxê kêfa meymûnê bêtur dîhat. Qêrina lawîk bêfayde bû. Şewqe jî êdî parçe-parçe bûbû.

Rêwiyên keştiyê çiqas dîkeniyan, lawîk jî ewqas soro-moro dibû. Wi xwe negirt, çakêtê xwe bî lez derxist û dest pê kir bî stûnê va hilperîki.

Lawîk hilkîşiya bû hetta wi ciyê ku meymûn lê sekînbû, lê hema wê gavê meymûn zûkava hilkîşiya û derkete jorê. Kurîk jî hey hîlkîşiya, hey jî bangî wê dîkîr:



"Tu jî destê min xilas nabî!"

Meymûnê jî her xwe berbî jor va dîkişand. Lê lawîk jî tim li pey wê bû. Piştî çend deqîqan herduyan jî xwe gihandibûne ser tepelûtka stûnê.

Pêşiyê meymûnê xwe gihandibû ser tepelûtka darê. Xwe bî werisê navbera du daran da dalîqandibû, bî lingê paşiyê jî şewqe avitibû nîkeki darê. Paşê jî derketibû ser serê stûnê û rûniştibû. Wîsa dîkeniya ku devê wê dighişte guhên wê.

Navbera stûna mezîm û serena ku weris pêva grêdayî bû, bî qasî du mêtira hebû. Jî bo ku xwe bigihîne wir, gerek him jî stûnê, him jî jî weris dîr bîketa.

Lawîk xwe tam dabû vê listîka bî heyecan. Destê xwe jî stûnê berda û rabû ser wî nikê (çiqilê) darê. Tu tîşteki dîn tunebû ku xwe bîsbartayê yan jî xwe pê bigirta.

Lî jêrê, rêwiyên keştiyê tev li meymûntiya meymûnê û li hewldana lawîk dînihêrin û dîkeniyan. Dûra dîtîn ku lawîk destên xwe jî stûnê jî,

ji weris ji berda û milên xwe vekir, dest pê kir ku li ser çiqilê bimeşe. Wê çaxê gişk sar bûbûn û ecêbmayi lê temaşê dikirin. Dilên wan ji tirsan dikir ku bisekine.

Eger lawik piçeki xwe şaş bikira, wê biketa û bımira. Ku xwe bigihanda serê çiqilê û şewqe ji wir hilda, paşê wê çawan vegeyria.

Çavê herkesi li jorê bû, dıpan.

Lı jêrê yeki ji tirsan dengêki ecaip derxist.

Jı ber vi dengi lawik bı xwe û kırınen xwe hesiya. Lı jêrê nihêri û denga wi xırabû. Niha bı zorê lı ser piyan dısekını.

Hema wê gavê, qaptênê bavê lawik derkete ser banê keşiyê. Dı destê wi da tıfıngê hebû. Dıxwast bı wê çend teyrikên masiyan bıkuje. Dema dit ku herkes lı jorê dınihêre, wi ji serê

xwe bıınd kir û nihêri. Dıt ku kurê wi ye derketiye ser darê serenê. Devê tıfınga xwe dıreji lawik kir û berbı jor kir qêrin:

"Xwe bavêje nav avê! Zû xwe bavêje avê! Tu xwe nevêji nav avê ezê te bıkujim!

Lawik mebesta bavê xwe fehmi nedikir. Bo çı xwe bavêje avê?..

"Yan tu xwe derhal davêji avê yan ji ez gulleki berdıdm te! Yeeek, duuu!"

Çawa bavê wi got "sê" wi milên xwe vekir û serserki xwe avête avê. Mina gulleke topê noqi avê bû. Beri ku pêlên avê wi bıpêçın, bı qasi bıst kesên ajnezan xwe lı dı wi avêtıbûn. Pışti sıh, çıl saniyan lawik derkete ser rüyê avê. Ev saniyên han ji keştivanan ra bı qasi saleki dıreji hatıbûn. Derhal lawik ji avê derxıstın anıne keştıyê. Pışti ku ji dev û pozê wi av kuşıya der, lawik çavên xwe vekir û bıhna xwe wergirt.

Dema qaptên dit ku kurê wi baş e, hındık mabû bıgri. Bı zorê xwe girt. Berê xwe da kamara xwe û çû. Nedıxwast kes bıbine ku ew dıgri.

Wergerdın ji turki: X. LEZGİN

Gur çawa tırsiyan?

(çiroka gel)

Rojekê malan barkir. Lı şına wara ma kerek, dıkek û beranek. Kêwrûşkeke beyani ji hat û gıhişte wan û her çar bı hevra lı wir çêriyan.

Du gur hatine wê derê û dıtın ku heywan dıçêrin. Gureki ji hevalê xwe ra got:

- Tu lı vıra qerewıl bısekine, ezê herım yekê bıkujim, têr bıxwım, paşê tu ji here yekê bıkuje, têr bıxwe.

Gur wexta berbı kerê çû, kerê serê wi xıste nava lıngên xwe û gıvaşt. Beran hat bı qoçan lêda. Kêwrûşk reviya û çû. Dık qe haj pê tunebû; nukulê xwe lı erdê dıxıst.

Bı awaki gur, ji destê wana xılas bû, çû gıhişte hevalê xwe.

Hevalê wi gotê:

- Te çawa kır?

- Mın çawa kır?

Ez wexta çım-


Yeki serê mın kire nav du dara.

Yek hate mın bı du gopala.


Yeki tırba mın dıkola,

Yeki ji hewari dıbire mala.

Gur ji tırsana êdi nêziki kerê, dık û beran nebûn. Jı wê derê revin.



(Jı "Zımanê Kurdi 3", H. Cındi, 1976)



Koška ZEMBILFIROŠ